




bar

WAR | WÊJE | WERGER | HEJMAR 4 | SAL 5 | HAVÎN 2020

“BI SERÊ WÎ KET
KU EW Ê TIŞTEKÎ
BAŞ BE HEKE KÛÇIKÎ
DI PENCEREYÊ RE
BIAVÊJE. ÊDÎ XWE
DAQÛL KIR
Û BI LINGEKÎ WÎ AJALÎ
GIRT Û EW HILDA
Û LI BA KIR.”

Stephane Crane
(1871 – 1900)



Merheba Xwendevanên Ezîz,

Ev demeke dirêj e ku *Bar* ji we dûr e. Wekî her kirde û bireser û tiştokên heyî, kovarek jî ji peywenda civaka xwe dûr nîn e. Civak çî be, ji tengasiyeke çawa re derbas be, bi reddyê û texeyyulên xwe berhemên wê jî jê tiştinan dihewînin. Bila derengbûna hejmara 4em jî wisa were hesabandin ji kerema xwe.

Ji ser hejmara ewil re çar, ya dawî re sê sal derbas bûn. Kar û bar û berpirsiyariyên me guherîn, her kesî xwe bi awayekî xwezayî bi derd û xemên jiyana rojane re mijûl kirin. Hin ji me bûn mamoste, hin ji me bi gelemşeyên şexsî re eleqeder bûn, ehd û cehda hinan jî çû ser qedandina zankoyê yan jî dîtina îş û karan bo debara jiyane. Bi awayekî fîzîkî jî em dûrî hev ketin, her yekî me koçî dereke din kir. Bêguman ev jî rê li ber girt ku em motîvasyona xwe bidin ser hev. Feqet her çiqas ne bi dilê me be jî bala me hinek ji *Bar* me ya delal belav bû û kovar bo demekê bi tena serê xwe ma. Nizam bi nezera we çawa ye, lê belê *Bar* hêj li ber dilê me ezîz e, biçûka malê û derba zêrîn a xortaniya me ye. Mala we tevan ji nozdeh ciyan ava ku we jî ew ji malê hesaband û hûn li ser ricifîn.

Bi saya *Barê*, me gelek dost û hevalên ezîz nas kirin, çîrokên ecêb seh kirin, ciyên seyr dîtin, govendên saesar girtin li xerîbiyê, ketin nav nîqaş û kêşeyan, cimaet û civatên dilsoz gerandin li metropolan... Bi kurt û kurmancî, ji karekî xortaniyê re ha baş ha xirab çî bivê ew qewimîn. Em pê serbilind û serfiraz in.

Lê belê em aniha li ber şîmika guherînekê ne. Ev hejmar dê bibe hejmara dawî ya qadroya berê. Bes dê *Simeya* bi lijneya nû re dewam bike. Ji hejmara 5em wêdetir dê *Yehya Omerî*, *Emerîkê Sidîqayê*, *Welat Ramînazad*, *Miradê Miradan*, *Ferec Koyistanî*, *Îbrahîm Şadman* û *Rêbîn Mihemed* dê xwe bixin bin vî karî û hîç guman lê tune ku ew ê asta kovarekê hey û hey bilindtir bikin.

Birrek tişt hene ku li ser camêrtî û canikîtiya rêhevalan bîn gotin. Spasiyên ji dil bo hemû cehd û xîreta Berfîn Ayşe Ogut, Cemed Loma, Micahîd Isikoglu, Tofan Sunbul û Daskan Dibbo. Hûn her hebin.

Bi xatirê we xwînerên ezîz.

Emanet qencî.

Merheba Xwendevanên Ezîz,

Piştî demeke dirêj kovara *Bar* dîsa li pêşberî we ye. Demeke dirêj e ev hejmara ku niha li ber destê we ye amade bû, lê belê ji ber çendîn sedeman me nekarî bigihînin ber destên we. Hejmara nû bi helbest, çîrok û nivîsên rengîn mişt e. Hevpeyvîna bi Koçer Bîrkarê ku di 2018an de xelata bîrkariyê ya Fieldsê qezenc kir û rûyê gelê xwe geş kir, yek ji wan suprîzên vê hejmarê ye. Kovara me li Parîsê xwe gihand Koçerî û derbarê xebat, hobî û hêviyên wî de hevpeyvîneke jidil pê re kir. Helbestkar û wergêrê hêja Kawa Nemir bi du soneyên xwe beşdarî li vê hejmarê kir. Şêxmûs Kurt, Derwêş Sancar û Simeya sê helbestkarên din ên vê hejmara teze ne. Emîn Metîn û Daskan bi wergera helbestên ji zimanê erebî û îngilîzî, Şivan Keleş jî dîsa bi wergera çîrokeke helbestkarê emerîkî Stephen Crane beşdarî li vê hejmarê kirin. Baha Khan, Mem Arîn, Rehmî Kurdziman, Mehmet Emîn Cîrîk û Mustafa Çelebî bi çîrokên xwe; Yûsiv Hemed, Emerîkê Sidîqayê û Micahîd Işıkoğlu bi nivîsên xwe û Ekrem Yıldız bi latînîzekerina çîrokeke Şêzad Hesênî cih ji xwe re xweş kirin di vê hejmarê de.

Her wekî ku Bilal jî amaje pê dike, kadroya *Barê* guherî û *Bar* ji vê hejmarê bi şûn de dê bi konsept û naverokeke ji berê cuda berdewam bike. Lew dem diguhere, barhilgir diguherin. Ji kadroya berê Bilal, Tofan, Daskan û Micahîd ji ber kar û barên xwe yên ku nedihîştin ku ew li ser kovarê kûr bibin, xatirê xwe xwestin û barê xwe spartin Emerîkê Sidîqayê, Welat Ramînazad, Miradê Miradan, Ferec Koyistanî, Îbrahîm Şadman û Rêbîn Mihemed. Mala yên çûn ava ku *Bar* gihandin ta vê derê. Bi xêr hatin ên nû ku dê heta qonaxeke dûr bi *Barê* re bin. Bala piraniya van hevalên nû li ser helbest, werger û rexneya helbestê ye, lewre piştî vê hejmarê kovara me dê bi awayekî ku girîngiyê bide helbest û wergera helbestê berdewam be. Ev yek gelekî girîng e, lew tevî ku li ba me kurdan helbest cûreyê herî zêde tê nivîsîn be jî li Bakur di nav me de nîqaş û weşanên taybet bo helbestê kêm in. Kovar, dê hewl bide ku bibe adreseke bo ev cûre nîqaş û nivîsên li ser helbesta kurdî. Her girêdayî vê yekê jî kovar dê di hejmarên nû de hewl bide bi helbest, werger û nivîsên çî rexneyî çî jî danasînî yên li ser helbestan biweşîne. Hevalê me Rêbîn ji Başûr û Îbrahîm jî ji Rojhilatê welêt e û ew dê hewl bidin bi nivîs, werger û hevpeyvînan xwe helbesta li van parçeyan bigihînin me. Helbet dê deriyê me ji cûreyên din re vekirî be û em ê ruh û giyanê *Barê* bi awayekî biparêzin.

Naxwe dîsa werin binoşin ji vê tehm û lezeta kurdiya şeng.

EDÎTORÊ GIŞTÎ

Bilal Ata Aktaş

LIJNEYA WEŞANÊ

Daskan Dibbo

Micahîd Işikoglu

Simeya

Tofan Sunbul

Yehya Omerî

Bilal Ata Aktaş

SERERASTKIRIN


Ronî Bedirxan


PÊŞBERG

Stephane Crane (<https://wordsworth-editions.com/author/crane-stephen>)

LOGO

Qerbelek

 kovarabar

 kovarabar

 kovarabar@gmail.com

© 2020 Bar - Hemû mafên naveroka kovarê parastî ne.

Bi tenê nivîskar ji nivîsarên xwe berpirsîyar in.

kovarabar@gmail.com

EDÎTORÊ GIŞTÎ

Yehya Omerî

LIJNEYA WEŞANÊ

(Ji hejmara 4em wêdetir)

Simeya

Emerîkê Sidîqayê

Miradê Miradan

Welat Ramînazad

Ferec Koyîstanî

Rêbîn Mihemed

Îbrahîm Şadman

Yehya Omerî


LOGO

Qerbelek

SÊWIRANDIN

Şemal Medya

semalmedya@gmail.com

 kovarabar

 kovarabar

 kovarabar@gmail.com

© 2020 Bar - Hemû mafên naveroka kovarê parastî ne.

Bi tenê nivîskar ji nivîsarên xwe berpirsiyar in.

kovarabar@gmail.com

NAVEROK

KÛÇIKEKÎ QEHWETARÎ

STEPHEN CRANE


10



DIWAZDEH ÇIRA JI GRANADAYÊ RE

ADONÎS

16



BIRAYÊN BÊPAR, KEÇÊN STÛXWAR

MEM ARÎN

22



JANKUJ 100 MG. 10 ŞÊXMÛS KURT

28

PÎREBOKÊN QUBALEKAN - II MEHMET EMÎN CÎRÎK

30

XATIRX- WESTIN

EMERÎKÊ SIDÎQAYÊ

34

HELBESTKAR QERS

KAWA NEMIR


36-37



KOÇER BÎRKAR JI BO CIWANÊN KURD DIBÊJE: HERÇENDÎ WELATEK WE TINE BE JÎ BILA ARMANCEK WE HEBE Û LI PEY WÊ BIÇIN

38

HEVPEYVÎN: SARA OGURLU,
MAMO ÎSSA, BILAL ATA AKTAS



NAVEROK

NÛCAN

DEWRÊŞ SANCAR

44

**MIN TU DOH DÎTÎ
TU DIMIRÎ**

MENAHÎL SEHEWÎ

45

QERETÎ

MUSTAFA ÇELEBÎ

46



HEVOK - 1

BAHA AKHAN

50

**MALÊK
LE AW**

ŞÊRZAD HESEN

57

**STRANEK
JI BO JINÊN
BÊTIVING**

SIMEYA

60

SEDSAL

REHMÎ KURDZIMAN

63

**R. 66 DOGVÎLLE:
TOLHILANÎNA
BEXŞANDINÊ**

MICAHÎD IŞIKOGLU

**R. 70 BIÇIM KÛ DERÊ?
PIRTÛKXANEYA BAJÊR
A LI STUTTGARTÊ**


YUSIV HEMED

**R. 72 TÊ BÎRA MIN
R. 78 LI ÇI GUHDARÎ
BIKIM?
R. 79 EV KÎ YE?**

KÛÇIKEKÎ QEHWETARÎ

STEPHEN CRANE

Ji îngilizî: Şivan Keleş

 @sivanokeles

Zarokek li serê kolanekê sekinîbû. Milekî xwe spartibû dîwarekî textikî yê bilind û milê din bi pêş û paş de dibir û di ber re bi bê xemî pêhn li zixuran dixist.

Roniya rojê di rûyê kevirên peyarêyê da û bayê havînî yê tembel jî tozeke zer hilda, ewrên tozê di kolanê re çûn û winda bûn. Kamyonên bi hing û ding bêxem di nav wan re derbas bûn. Kurik sekinî û bi xewndarî ji xwe re temaşe kir.

Piştî demekê, kûçikekî qehwetarî bi qesd û armanc di ser peyarêyê re ber bi wî ve beziya. Werîsekî kinik bi gerdena wî ve dikişkişî. Her ji çend gavan jî pê li dawiya werîs dikir û diterpilî.

Li hemberî kurikî sekinî û her duyan bi rêzdarî li hevdu nêrî. Kûçikê bîstikekê dilodînî ma, lê ji nişkê ve terriya xwe hinek nîşan da. Kurikî destê xwe ber pê ve kir û bang lê kir. Kûçikî serê xwe xist ber xwe û xwe nêzîk kir û her du bi hevaltî bi hev şa bûn û tep li hev dan. Kûçik bi vê hevdîtînê re hêdî hêdî dilgermtir dibû heya ku bi lotikdana xwe ya dilxweş re kir ku kurikî totlanî hev bike. Kurikê me li vir destê xwe hilda û kulmek li nava serê kûçikî xist.

Xuya ye vê yekê zora kûçikî bir û ew şaşmaşo kir, birîneke kûr di nava dilê wî de kir. Xwe bi melûlî tewand û li ber pêyên kurikî xwe vezeland. Gava ku kulma diduyan hat avêtin û pê re hevokên zarokane yên pêdexeyidînê bihîstin, xwe qulipand û pala xwe da erdê, lepên xwe bi awayekî ecêb hildan. Di ber re bi guh û çavên xwe lavayeke biçûk ji kurikî re kir.

Li ser piştê xwe, ewqasî kenê mirov pê dihat û tev lepên wî yên ku bi awayekî ecêb li ba dikirin, kêfa kurikî gelekî hat û tepên biçûk bi dû hev de lê dan ji bo ku wî di wê rewşê de bihêle. Lê kûçikê me yê qehweyîya tarî cezayê xwe bi awayekî ciddî stend û bêguman xwe dît ku sûcekî mezin kiriye, ji ber ku xwe bi poşmanî li hevdu badabû û bi her awayê ku ji dest dihat jî tobedariya xwe diyar dikir. Xwe li ber kurikî stûxwar kir, jê rica kir û bêhtir jî li ber gerriya.

Di dawiyê de kurik westiya û nema sebra wî pê hat, berê xwe da malê. Kûçikî di wê demê de hîn rica dikir. Xwe pal da û berê çavên xwe da çûyîna wî.

Yekser hêz da xwe û rabû ser pêyên xwe û da dû kurikî. Yê din jî bi xemsarî ber bi mala xwe ve diçû, car caran jî disekinî ji bo li tiştin vir de wir de binêre. Di yekê ji wan seknan de bala xwe dayê ku kûçikê qehweyîya tarî wek rêbirrekî daye dû wî.

Bi dareke biçûk ku berê dîtibû, kurik li peygerê xwe xist. Kûçik jî rûnişt û li ber gerriya heya kurik ji lêdanê têr bû û rêya xwe domand, dûre xwe kişand heya ku li ser pêyan bû û dîsa da dû kurikî.

Li ser rêya malê kurikî gelek caran berê xwe da paş û li kûçikî xist û bi nîşanên zarokane îlan kir ku kêfa wî jê re nayê, di çavên wî de kûçikekî bêqîmet e û ji bilî kêliyêkê ti qîmeta wî tune bû. Ji ber ku heywanekî nebaş bû, kûçikî lêborîn xwest û bi rêz û hurmet poşmaniya xwe diyar kir, lê bi dizîka dîsa da dû kurikî. Hingî kiriyara wî sûcdar xuya dikir xwe wek kujerekî kişkişand.



Dema ku kurik giha ber devê deriyê xwe, kûçik li pişt wî bi çend gavan bi biryarî diçû û dihat. Dema ku dîsa bi kurikî re rû bi rû hat, hingî ji ber fediyên dilteng bûbû, werîsê bi xwe ve ji bîr kir. Dîsa lê terpilî û bi dev û rûyan ve çû erdê.

Kurik li ser pêlikê rûnişt û hevdîtineka din di navbera her duyan de çêbû. Di vê hevdîtinê de kûçikî xwe baş lê da ku kurikî razî bike. Wî çend lotikên wisa bê serî dan, ku di çavên kurikî de ji nişkê ve dîsa qîmeta wî çêbû. Kurikî xwe bi lez livand, bi awayekî hişk xwe nêzik kir û werîs zêft kir.

Wî girtiyê xwe kişkişand hundirê holekê, di maleke tarî de û ew di ser gelek pêlekanaan re hilkişand. Kûçikî ji dil hewl da, lê ji ber ku biçûk û nermik bû, nikaribû bi şarezayî di ser pêlekanaan re hilkişe, di dawiyê de hingî leza kurikê dagirtî bi hêz bûbû, kûçik ji tirsan veciniqî. Di dilê wî de bû ku ber bi erjengiyê nenas ve tê kişkişandin.

Awirên wî ji ber wê tirsê dijwar bûbûn. Dest pê kir, serê xwe bi xezeb hejand û lingên xwe hişk bi erdê ve zêft kir.

Kurikî hêza xwe du qat kir û li ser wan pêlekanaan di navbera wan de şerek qewimî. Kurik bi ser ket ji ber ku baş bi mebesta xwe ve girêdayî bû û ji ber ku kûçik pirr biçûk bû. Bin destê xwe kişkişand heya ber deriyê mala xwe û di dawiyê de ew bi serfirazî di ser derazînkê re derbas kir.

Kesek li malê tine bû, kurik li ser erdê rûnişt û bixêrhatina kûçikî kir. Kûçikî jî yekser ew bixêrhatin qebûl kir.

Çavên wî bi hez û naz ji hevalê wî yê nû re diçûrisîn. Dem tê re nebihurî, bûbûn dostên ji dil û can jî.

Dema ku malbata kurikî hat, gelekî bi hêrs bû û pê re xeyidî. Kûçik hat ezmûnkirin, li ser hat şîrovekirin û nav lê hatin kirin. Awirên tûj ji hemû çavan bi ser de bariyan, heya ku fedîkar û stûxwar bû wek dareke şewitî. Lê kurik bi mêrxasî çû li nava odeyê sekinî û bi dengê xwe yê herî bilind pesnê kûçikî da. Îcar dema ku bêzariyên xwe bi barebar digotin jî destê xwe li dora stûyê kûçikî gerrandibû, di wê demê de jî bav ji karê xwe vegeriya.

Bavo xwest bizane bê ka ev çî agir e ku hiştiye zarok wisa ewtewtê bike. Bi gelek awayan jê re rave kirin ku kurikê beredayî dixwaze kûçikekî rezîl tevî malbatê bike.

Civîneke malbatî hat gerrandin. Qedera kûçikî li ser wê civînê mabû, lê ne xema wî bû jî, ji xwe re bi cûtina dawiya kirasê kurikî ve mijûl bûbû.



Mesele zû bi dawî hat. Xuya ye wê êvarê bi taybetî bêhna wî, bavê malbatê, zêde teng bû, dema fêhm kir ku mayîna kûçikê wîsa dê her kesî matmayî û bi hêrs bike, biryar da ku kûçik bimîne. Kurik tev girîneke hêdfî rabû û hevalê xwe bir quncikeka vala li odeyê ji bo ku pê re şa bibe, di wê demê de jî bavo jî hewl dida hêrsa jina xwe aram bike. Êdfî bû rastiyeke ku kûçik endamêkî ji malbatê ye.

Ew û kurik her dem bi hev re bûn ji xeynî dema ku kurik radiza. Kurik jê re bûbû dost û zêrevan. Dema ku yê mezintir pêhn li kûçikî didan an jî tişt diavêtinê, kurikî bi dengê bilind û bi tundî ew şermezar dikirin. Carêkê hêsr ji çavên wî dibariyan, destên xwe dirêj kiribûn û baz dida ji bo ku hevalê xwe biparêze, taweyeke mezin ku ji destên bavê wî yê ku ji bêrêziya kûçikî bi hêrs bûbû hatibû avêtin, li nava serê wî ketibû. Piştî wê rojê malbat gelekî haydar bûbû bê çawa tiştan biavêjin kûçikî. Bi ser de jî, kûçik elimîbû bê çawa xwe ji ber sarûx û pêyên wan bide alî. Di odeyeka biçûk de ku argûnek, maseyek, nivîsgehek û hinek kursî tê de hebûn, ji xwe re hunerên stratejiyê yê ji asta bilind hazir dikirin, xwevedan, xapandin, fêlbaziya di navbera mobîlyayê re. Dikaribû bihêle sê kesên ku melkes, darik û kulmek komir di destên wan de bûn, bi zor û heft belayan derbekê lê bidin. Gava lê didan jî kêman derbek lê didan ku wî bi rastî biêşîn yan bitevizîn. Lê dema ku kurik amade bû, tiştên wîsa nedihatî kirin. Hatibû naskirin ku heger kûçik were acizkirin, wê kurik xwe ji girîneke bibehêcîne û ji ber dema kurik har dibû pirr serhildêr bû û kesekî pê nikaribû, kûçikî ew ji xwe re kiribû zêrevanek. Lê kurik nikaribû her dem li dora wî bûya. Şevan dema ku razayî bû, hevalê wî yê qehweyîya tarî ji quncikeke tarî nalîneka hov û bi êş, straneka tenêti û neçariya bêdawî distira ku dengê wê bi îskefîsk û lerizîn di nava avahiyên kolanê re difirriya û dihişt ku xelk xeberan jê re bidin. Di wan deman de li dora metbexê didan dû stranvanê me û bi alavên cûrbicûr lê didan.

Carinan kurikî bi xwe jî li kûçikî dida, kes nizane bê ti carê heq dikir yan na. Kûçikê reben jî ew rezîlandina bi hesteke sûcdariyê li xwe qebûl dikir. Dizaniyê ji ber ku kûçik e nikare hewl bide xwe, bike gorî û heyfhi-lanînê plan bike. Bi rezîlandineke mezin ew kulm dixwarin û bi ser de jî kêfîka ku lêdan bi dawî dihat li hevalî diborand û amade bû ku bi zimanê xwe yê sor ê biçûk destên kurikî bialêse.



Dema ku serê kurikî diket belayan de û zora wî diçû, gelek caran bi çarlepki dixuşiya binê maseyê û serê xwe yê biçûk ê bi êş datanî ser pişta kûçikî. Her dem jî dilê kûçikî pê dişewitî. Qet nedibû di demên wisa de ji kûçikî re bibe derfet ku behsa lêdanên ku hevalê wî di dema hêrsê de dianî serê wî, bike.

Ti hevaltîyên eşkere bi endamên din ên malbatê re ava nekiribûn. Li wan amin nedibû û dema ku ber bi wî ve diçûn û ji wan ditirsiya, hêrsa wan bêtir dibû. Kêfxweşiyeka taybet bi wan re çêdibû dema ku kêmxwarin didan wî. Lê vê dawiyê kurikê dostê wî, ji alî vê meseleyê ve hişyar bûbû û heq jê derdiket. Dema ku wî ji bîr dikir jî kûçik bixwe bi dizîka heq ji xwe derdiket.

Axir, halê kûçikî xweş bûbû. Ewtewteke wî ya bilind çêbûbû ku bi awayekî ecêb ji kûçikê wisa hûrik der dihat.

Bi şev jî nema zêde dikir ûreûr. Carinan di xew de bi rastî jî nalînin dengnizm wek ku ji ber êşê jê dihatin, lê bêguman jê dihatin ji ber ku di xew de li ber kûçikên qerrase yên bi saw disekinî û ji wan vediciniqî.

Hezkirin û dilsoziya wî ya ji kurikî re, bûbû ji asta herî bilind. Bi hatina wî re ji kêfan lotik didan, bi çûyîna wî re bi neçarî diçilmisî. Dengê gavên lingên kurikî ji nav dengên taxê hemûyan nas dikir. Jê re bûbû wek dengê bangekê.

Devera civîna wan dibû memleketek û mîrê wê jî ew zarokê kambax bû, lê ne rexne û ne jî serhildan di dilê wî bindestî de tine bû. Di kûrahiya zozanên veşartî yên canê wî heywanî yê wî kûçikî de, gulên hezkirin, dilsozî û bêkêmasîtiyê şîn hatibûn.

Kurikî ji xwe re kiribû edeteka her demî ku derkeve û li hawîrdora taxê li tiştên seyr û ecêb bigerre. Di van gerrînan de hevalê wî bêtirê caran li dora wî bi qirarî û dilxwazî dibeziya. Lê carinan jî li pêşiya wî dixist. Ji ber vê yekê jî her çaryeka deqeyekê berê xwe dida paş ji bo ku dilê xwe bixe cî de ku kurik bi dû wî de ye. Giringiya van gerrînan wilo hişê wî dagirtibû. Xwe wisa li ba dikir û difirriya. Serbilind bû ku zêrevanê mîrekî qerrase ye.

Lê rojekê bavê wan gelekî serxweş bûbû. Vegeriya malê û bi jina xwe, beroş, taweyên xwarinê û mobîlyayê re şahiyek çêkir. Bav di nîvê dilşahiya xwe de bû û kurik û kûçika qehweyîya tarî bi dû hev re derbasî odayê bûn. Ji gerra xwe vedigeriyan.

Kurikî bi awirekî tûj yekser rewşa bavê xwe tê derxist. Xwe bi lez avêt

bin maseyê, ji serpêhatiyên berê hîn bûbû ku ew devereka amin e. Kûçikê ku hunera wî di tiştên wisa de tine bû, hayê wî ji bayê felekê tine bû. Bi çavên xwe yê tije, bi balkêşî li xweavêtina hevalê xwe ya ji nişkê ve nêrî. Ji wî we ye ku maneya wê yekê lotikdana bi kêf û şahî ye. Dest bi teprepê kir li ser erdê ji bo ku tevî hevalê xwe bibe. Di wê kêliyê de bûbû dîmenê kûçikekî qehweyîya tarî ku ber bi hevalê xwe ve diçû.

Serokê malbatê di wê kêliyê de ew dît. Ūrîneka dengbilind bi kêfxweşî ji qirrika wî derket û bi cizûweke qehweyê ya giran kûçik li erdê da. Kûçikê ku bi saw û tirseka mezin dinaliya, bi ser pêyên xwe de ket û revî-revî li xelasê gerriya. Mêrikî bi pêyê xwe yê giran loteka xurt lê da. Wê pêhnê hişt ku kûçik bizîzike wek ku pêlekê ew zeft kiriye. Derbeyeka din ji cizûwa qehweyê ew li erdê perixand.

Wê kêliyê kurikê ku bi dengê bilind fikir barebar, bi mêrxasî wek siwarekî hat. Bavê malê guh neda gaziyên kurikî, bi kêf bi ser kûçikî de çû. Kûçikî jî piştî ku du derb bi ser hev de xwaribûn hêviya xwe ji revê birrîbû. Xwe qulipand ser pišta xwe û bi awayekî ecêb lepên xwe hildan. Di ber re jî bi çav û guhên xwe duayeka biçûk kir.

Lê belê kêfa bav xweş bû, li serê wî ket ku wê tiştêkî baş be ku kûçikî di şibakeyê re biavêje. Xwe daqûl kir, bi lingekî wî ajalî girt, ew hilda û li ba kir. Ew bi kêf û ken du sê caran li dora serê xwe zîzikand û dûre bi qîrar ew di şibakeyê re virvirand.

Kûçikê ku difirriya cîran ecêbmayî kirin. Jinekê di şibakeya li hemberî wan de gul av didan bêhemdê xwe qêrînek da û guldanek ji destê xwe xist. Zilmekî di şibakeyeka din de xwe bi awayekî xeter daqûl kir ji bo ku firrîna kûçikî bibîne. Jinekê cil li hewşekê radixistin wek dînan da lotikan. Devê wê tije liqatên cilan bû, lê bi destên xwe nişana ecêbmayîne da. Şiklê wê bûbû wek yê girtiyekî devgirtî. Zarokan jî bi barebar baz da.

Ew laşê qehweyîya tarî bû kulmek û ket ser banê koxikekî pênc qatan li jêr. Ji wir jî gindirî heya ku li ser peyarêya kolaneke teng sekinî.

Kurikê li wê odeya li wê jorê qêrîneka dirêj wek giriyê li ser miriyan ji qirrika wî derket û bi lez û bez ji odeyê derket.

Demeka dirêj derbas bû heya giha kolana teng ji ber ku ji biçûkbûna laşê xwe mecbûr mabû paşûpê di ser pêlekan re gav bi gav dakeve. Bi her du destên xwe jî pêleka di jora xwe re qenc zeft dikir.

Gava ku dûre hatin dû wî, dîtin ku li teniştê laşê hevalê xwe yê qehweyîya tarî rûniştî ye.



Diwazdeh Çira ji Granadayê re

ADONÎS

Ji îngilîzî: Daskan Dibbo

 @daskan

1

Li ser axê û li asîmanê malek
Ev der navbera Behra Spî û Sierra Nevada ye.
Çiya, berav û pêl
Dest didin hev bi dostanî,
Behr, pacên darê dorpêç dike.

Ha va ye deriyê Gomerezê,
Xeyalên helbestvanan dibînim
Yên diçine ser El-Hemrayê.
Hugo, Gongorra, Jimenez, Rilke, Lorca
Armando Blasio Weldes dibihîzim:
Çend caran min xwestiye ku
Ez di serdema Granadayê de ji dayik bibûma”.

Ev der ji dengvedanên dîrokê re teng e.
Ji giyanê vê axê re teng e dîrok.
Tenê helbestvanek dikare pirsra rast bipirse,
Dikare fêhm bike ji giyanê bêhnên rihanan,
Bi lêvan tehm bike, şeraba wateyê.



2

Ha va ye, El-Hemra deriyê xwe ji ezmên re vedike.
Piştî her nîvroyê silav li çêlkên xwe dike.
Bi destekî, xwe spartiyê lavayê,
Destê dî birîn û xwîn.

Va ye çemê Darro yê pêxwas:
Tenê bi xirxalekê hatiye xemilandin.

Dîwaran roj dorpêç kiriye,
Va ye, siya rojê û rengên rojê li ser dîwaran.
Ez xwe dispêrime meylên xwe,
Û xwe ji xeman dişom.
Dibime Ademê afirîşê,
El-Hemra jî dibe Hawaya şaristaniyê.

Xewnan dibînim û xewnan dibînim,
Bê xewn ez nîn im,
Ji birçiyên şevê re şîv im.

3

Ez diketimê an derdiketim,
Di nava kember û enîşkan de,
Dema ku bêhna her asmînê
Ez her kêlî serxweş dikirim?

Di baxçeyên xeta kûfî û xeta nesîh de serxweş bûm.
Muzîk min dide ber xwe û dibe,
Ber bi her deverê ve û ne ti deverê ve.

Minminîk rengê xwe didine dîwaran.
Û li vî warî, herrî strana pesnê ye.

Jiyan — gewherek e di navika çengiyekê de.
Û stêrik jî bisk e di bin guhên wan de.



4

Netirse ku tu dest bidî ewran,
An jî bila gavên te nericifin!
Li qada şêran û rihanan,
Di derenceyekê re dadikeve hîv.
Rûyê xwe şanî hîvê dide.
Te dî ji bo ku rûyê hezkiriyan bicivin
Ronahiya çirayan fedî dike û kwîr dibe.

Di hestûyên lingên van stûnan de
Defneyên bêdengiyê dikine pisepis
Yên ku kemberê wan ewr û pêl in.

Kî ye ev nexşkarê bêkêmasî?
Yê ku di nexşên xwe de stêran dîl digire.

Ez bi pênuşa xwe pesnê wan didim,
Ji bo ku kaniya demê biherike,
Di nav gotinên min de.

5


Ha va ne beşên bihuştê li vir in,
Û ev in hînkerên min.

Qefesa bihuştê ev bask in,
Hildigire kêfa wê, mîna xezalan,
Yên ku di bin siya vî banî de ne.

Ha va ye, ebedîtî cibeyek li xwe kiriye,
Aso di hundirê çirayekê de pîrnijiyê.

Guh bidin kendan:

Bibin govanê cotbûna tav û şevê
Fenanî dawetekê di nava min û xwe de.




Bêrkirin û tehmê ew ji min stand,
Êdî laşê min ne yê min e.
Dest ji min berde,
Arezûyên min hişyar bike

6

Ha ev hebûnî,
Dikevine qulên derziyan,
Yên ku qepalan ji pacan re didirûn.
Ez li wê derê keştiyan û
Stirehên nêriyên pezkoviyan dibînim.
Wek ku yek ji wan hildikişe serê
dareke xurmê,
Ez li dûrahiyê temaşe dikim.





Nizanim çima digirîya ew pac,
Dema ku min xatirxwestinên şîn
dirêjî dikirin.
Hîv bi ewran hatibû dorpêçkirin,
Min berzîş dîtî,
Yên ku pacên El-Hemrayê hatibûn
çêkirin.

Pacên mîna golan,
Yên ku tenê keştiyên xeyalan
Dikarin tê de bi cih bibin.
An guharkên di guhên stêrkan de?
Valahî peyvek e ku
Li navê El-Hemrayê nayê.

7

Li hemama Komaresê;
Di nava zer, şîn û sorê de,
Av diherike bêdengiyekê ku nayê
gotin.
Dibe ku tu fêhm bikî bê çima wiha ye.

Ha şirşiranek dikin ku bibin
gewdeyek.
Karê avê jî hema ku veguhere
stranekê.
Her yekî ku xwe dişoye,
Dibêje qey asîman wan hemêz dike.
Xweza û wêdetirê xwezayê destê xwe
Di stûyê wan re dibe.
An, ez dibêjim qey wiha ye.

Ez fikirîm ku bi min wiha ye
Û min got: “Di vê serxweşiyê de
baştir e ku mirov nizanibe binyata
tiştan çi ye”.

Wê şevê Granada
Ne di xeyalên min de,
Lê di dawa min de di xew ve çû.
Dest ji wan cilên xemilandî berde,
Ji veşartinê pê ve bi kêrî tiştêkî nayên.



8

Li El-Hemrayê enîşkekê pistepist kir,
Ji min re got:
Wek ku tu bi ser jinekê ve bibî,
Qet nefikirîm ku dest jê berdim.

“Memikên min hene,
Lê kes nîn e wan mist bide.
Bibe weke min,
Bigere, lê di laşê xwe de,
Ku tu bikarî fezayê hemêz bikî”.

Min ji enîşkeke dî re got:
“Li vî warî, hiş xizmeta hestan dike.
Xemilandin e, ya ku deng dide herriyê
—
Dê bigihe vê xemilandinê, bê tu li çi
dinêrî,
Yên ku ji rê derketine, hez nakin
Asîmana ku erxewana gumanê li xwe
dike”.

Enîşkên El-Hemrayê zanîna xwe
dabeş dike.
Ji wan re ronî dibare, pirskekê
nekeşkirî.
Ev enîşk her tim cilên xwe
diguherînin,
Dema ku tîrêjên rojê ji hêla gumanan
ve dihatin girtin.

9

Gulê, tu ji xwe re hewayê tentene bike
Û gavên bêhna reqsa xwe bavêje.
Hebûna te tenê bêhn e,
Lê dilê kulîlka te zû dimîne.

Bila bêhna te meşxeleyên bîrê pêxe.
Li vir; di nava hinar, pirteqal, zeytûn û
hejîran de
Ez weke zarokekî me ku hînî tîpan
dibe.

Va ye Generalîfe,
Ez sosin, asmîn û pelên mûtikê
dibînim,
Û di bin kela nêrîngê de
Ez taca hîva Lorca diyarî xwe dikim.

Ez ê bêjim, “Giyane dîwaran jî heye,
Û çiqilên daran çûkên koçber
dihewînin,
Baskên wan xweşik in,
Her çiqas wan bitewînin jî.”
Va ye Generalîfe.
Bêhn têrî dîwarên girtî nake.
Û av qet kaniya xwe diyar nake.

10

Dema çûyî, mîna siya seyareyeke
şikestî ye.
Sal mîna dûyê belav dibin û diçin.
Ez ji dîwarên El-Hemrayê re çi bêjim?

Ez cilên xwe biqetînim?
Ez bixwazim ku stûnên wê bigirîn ji
bo min?

An ev dem bixwe ye wilo bang dike
min?

“Wext nebû ku ez birînên xwe
derman bikim”.

Granada, ez xeyala te qebûl dikim,
Qermûçekên ketî aşî dikin ew xeyal.
Ez guh didime qesîdeyan,
Yên ku ji bircên wê daleqiyane.

Û li vir mîna tembûrekê,
Xwe dide ber guhê min ev şev,
Da ez heya destpêka rojê bistrînim.

11

Dema ku helbest silûetê xwe li ser
gerdûnê xêz dike
Bextek ji zikê El-Hemrayê dibêje:
Ûsturlapekî dî ji dayik dibe?
Û ez çima jê hez nakim;
Ji bilî yên ku ez nikarim bibînim?
Û bi vî awayî ez afirîn û kiryarê
dikime yek;
Yên weke hev û ên ji hev cuda.
Û ez dibêjim;
Bila destên Granadayê
Qadên siberojê
Û hemû tiştên dahatûyê pîroz bikin.
Ha va ye gavên Granadayê dinivîse;
Muvaşşahên gerdûnê, bi hibra yekta.



12

Guh bidine Granadayê, helbestvanino;
Yên ku dil ketibûn êvarên çûyî û hatî,
Êdî dil bikevin sibehên ronî.
**Bila şev destpêkên sibehan amade
bikin.**
Bila ji te re asoyê vekin,
Û bi saya hemû kûrahiyan, tu li
bilindahiyên bimînî.
Mîna rojê, mîna Granadayê
Û mîna her du hinarikên te;
Hêlek li rojhelat,
Hêlek li rojava.





MEM ARÎN

@mem_arin

BIRAYÊN BÊPAR, KEÇÊN STÛXWAR

-Ji bo keçên ku her tim bûn qurbanîyên erf û edet û mêjîyên genî-

Çoçika xwe li nava şîva ku bi saeta bû dikeliya û bi ser beroşê re qelîbîbû xist û bi keser milmilî:

-Axx dayê, dayika min, qurbana te bim, kes nizane niha di çi halî de ye, rebenê dayê, ka te rojekê xêr ji wî emrê xwe yê bi kul û keser dît? Ji ber kar û barê pîs ê ku ne diqede ne dawî lê tê, niha kes nikare tasek av jî li dêv bikê, pepûka min, ez niha li wir bama... keserek din kişand:

-Rê jî dâr e, bêjin Zeyno, Zeynoka bextreş tu ewqasî ma, bi taliya emrê xirab re te mêr nekira û nehata bi Îzmîra şewîtî ve derneketa, qey te pir meraqa vî mêrê hûrfilitî dikir û bi nefret got:

-Tunebûna wî ji hebûna wî çêtir bû, ji êvar de heta sibê di nav cîyan de pişta xwe bi min de dike, min çi fêhm kir. Ji vî emrî û şûn de zewac heram e heram! Û di ber xwe de got: Tiştê ku tu bi dest û tiliyan rake dilê meriv rehet nake!



© Adem Sönmez

Xebera ku ji êvar de bihîstibû xew lê herimandibû, raneketibû. Şivaqê jî zû hişyar bûbû ji xewê, vir de wê de digeriya, hebînî nedigirt... li vî bajarê xerîb, bi her awayî xerîb... jiyana xerîb, bêtehm, têkiliyên însanan xerîb, hatin xerîb, çûyîn xerîb, roj xerîb, roj revok, roj kin, roj bêberket, roj bêkêf û şahî...

Ji xwe berî niha ka çi ji xwe, çi ji emrê xwe, çi ji malbata xwe fêhm kiribû, jiyaneke bêhûde...

Malbat... Malbat çi bû çi nebû heta niha? Çil û pênc sal derbas bûbû, qet ev pirsra ji xwe nekiribû, têkiliya wê û malbatê tişteki xwezayî bû, îcabî lêpîrsînê nedikir bi ya wê.

Her kar li ser milê wê bû, ji ber ku keça malê ya mezin bû, ji bo xwişk û birayên xwe yê din him dê him jî xweh bû; xwarina wan, vexwarina wan, serşûştina wan... Serşûştin gava hat bîra wê bişirî, carinan ku zaroka xwe ji serşûştinê aciz dikir, bêhna wê teng dibû û digot çelq şîrmaqeq pê ve dişidand, heye ku zêdetir dibû qîjîna wan...

Bihar dihat. Zeyno bêrîvan bû, serbêrî bû, hilêwî (pezdoş) bû, dangîvan bû... ku zivistan dihat dîsa sekn û rawestan li Zeyno tune bû, karê malê û ajalan giş li ser milê wê bû; êmdayîn, avdayîn, paqijkirina zibil û rêxê,



kişandina ka û ceh... Helbet ne tenê bû, xwehên wê Berfê, Gulê, Sosin jî bi wî awayî bûn, bes yek jî ne bi tayê Zeyno bû. Devê bavê wê Hecî Qadir ji hev radibû, digot Zeynoka min gula mala me ye, stûna mala me ye û meşk didan bin çengan. Carinan kêfa wî li cih ba digot Zeynoka min tu mêran neke ez di devê bavê wan nim, tu tev bavê xwe bimîne, jixwe tu ji her kul-fetê malê bêhtir dixebitî tu di mala min de birapara min î. Zeynoka bextreş jî jê bawer dikir, digot qey rast wê bibe birapar mîna ku hîç li der û dora xwe, rewşa keçên gund û cîranên xwe nedîbe, bi Xwedê xêliya gewr bile bi ser sêrî de nedikir û bi destan digirtin, ji malê derdixistin! Îja dora mal û milk bidin jinê.

Xwedê wekîl e ku qaşo digotin em misilman in û li gor misilmantiyê, du par ji law re yek ji keçê re bû. Ew jî nedidanê, te jê bipirsiya jî misilmanên ji wan çêtir tune bûn!

Zeyno kevçiyek li nav şorbê xist û hêdîka bir devê xwe:

-Ax tehm jî di devê min de nemaye, tew nizanim çawa bûye; xwêya wê sor e yan bêxwê ye, nizanim... Ka tehm, xwezka hew tehma dêv ba ya ku nemaye, tehma jiyanê li ku ma ye, tehma stranan, tehma çîrokan, tehma têkiliyan...

-Offf, keserek dîsa kişand.

Dilê wê hat bîrê; hê pazdeh - şanzdeh salî bû Xwedêyo, hê nû morî ketibû çîçikan, keçeke nûhatî... Bejna zirav û bilind, çavên şîn ê birqokî, rûyê sor ê hinarî, guliyên sor ê fitil fitil xwe berdida ser qolincê, wek du werîsê barê karwanê Helebê yên zemanekî... ku çavê xortan lê diket dilê wan dikir gupegup, aqil diçû, bê hiş diketin, xewna hemû xortên êlê Zeyno bixwe bû.

Xwazgîniyê wê yek radibû yek rûdinişt, Hecî Qadir her carê derewek peyda dikir:

-Heyra ma keçika me hê zarok e ne wextê wê û mêt e, hela herin em wek malbat bi hev bişêwirin, ma mala nizanim kê xwestiye me soz daye, keçika me dibêje ez lawikê wan naxwazim û hwd.

Çi rewşeke sosret bû ku Hecî Qadir rojekê bile ji Zeyno fikrê wê nepir-sîbû, ka ew çî difikire û kê dixwaze. Mebesta wî ka bila hinekî din bimîne û kar û xizmeta wî bike.

Zeyno têra xwe pozbilind bû, na na, hay ji wan tune bû, wê tenê ji xor-tekî çeleng hez dikir: Ehmed.

Evîndara Ehmed bû, ji zû de bi hev re bûn, ewilî cîranê hev bûn, lê di pê re mala Ehmed bar kiribû, çûbûn aliyê gund ê din. Kêf û henekên wê û Ehmed ji bîrê nedîçûn, pevşabûnên bi dizî, bi coş û hêcan, bi zewq...

Heta ku rojekê bihîst ku Ehmed dike bi dotmama xwe re bizewice, dinya li ser serê Zeyno xera bibû, dil di bin kavilê hezkirinek xapînok de mabû. Ka Ehmed digot ez mirim ji axa sar re ku ez mam ji te re me delala min! Hemî derew bûn nexwe...

Ji wê rojê û şûn de rihê wê, dilê wê, hezkirina wê birîndar bûbû. Gelekî jî hestiyar bû, diltenik bû, zû digiriya. Nemaze gava ku Hecî Qadir carinan nexweş diket, dilê Zeyno di ber nedihat û her bi dengê bilind digiriya, mîna ku sedema nexweşiya Hecî Qadir ew bixwe be, ma hew Hecî Qadir tenê, na na, hema tiliya kê xwîn biba giriyê Zeyno amade bû. Carekê jî ji bo xwişka xwe Sosinê pir giriyabû. Çaxê ku Sosin dane mêr, hê nû ketibû 14 saliya xwe, ji ber ku birayê wê qîz revandibû mala bavê qîzê jî digot heq û neheq divê hûn wek qebhet Sosinê bidin lawikê me, ne wer be em ji hev nagerin. Hecî Qadir jî ji neçarî rabûbû bi destê Sosinê girtibû, dabû de'w û qebhetan. Sosina reben, pepûkê, qîrîn û giriyê wê diçû 'erşê 'ala, xwe diavêt hembêza dê nedibû, xwe diavêt hembêza bira nedibû... Her kesî rûyê xwe diguherî, ji ber qanûn û erf û edetên civakê kes nedibû kulmek xwê ku birîna Sosinê bikewîne, herî dawî dest diavêt stûyê Zeyno! Zeyno: xwişka mezin, ne tenê xwişk; dê, rêheval, hemraz... Zeyno çavşil bû jixwe, her du jî bi saetan bi ser hev de giriyabûn, qîriyabûn lê çi fêde... Talî ji hev qetandibûn û Sosin biribûn. Yek jê bûyera ku zêdetir bandor li ser Zeyno kiribû ev bû û belkî cara ewil bû, xwe bixwe li ser rewşa jinan, civakê û ev erf û edetên hovjiyan fikirîbû. Ma hew Sosin, li der û dorê bi dehan qîzên biçûk ên di bihara temenê xwe de xêliya spî bile bi ser de nedikirin û bêyî ku ew kê dixwazin ji kê hez dikin didan mêr.

Nîvro bû, êdî wextê firavînê bû, ma hê şorbe nekeliyabû, çocikek li nav xist û bala xwe dayê, di ber xwe de got:

-Bimbarekê, bû goştê gayê pîr, nebû li hev bigerin, ev nîskana bikelin, de wa ye hindik pê maye.



Dîsa dêya wê bi bîrê ket. Axx dayê, qurban dayê, pepûka Xwedê, kes nîzane niha di çî halî de ye. Le îja ji bin... na na Xwedê neke, devê min bişikê. Bi xwe de qeherî ji ber ku ihtimalek wisa xirab hat hişê wê.

-Ji bin kêrê dernekeve ji ku derket, ma rojê bi hezaran kes diçin emeliyat dibin û sipîsax dibin.

Piştî ku evîndarê wê Ehmed zewicî Zeyno derê dilê xwe ji her kesî re girtibû, derew û fen û fûtên Hecî Qadir li aliyekî, Zeyno jî êdî guh nedida kesî û qismetê wê ranebû. Çend xwişk û birên wê hebûn, giş zewicîbûn, çûbûn bûbûn xwedî mal û zarok.

Sal li pê hev digindirîn û derbas dibûn. Sal bayê felekê bûn, gelek tişt dizîbûn, biribûn lê... Ya herî berbiçav bedewiya Zeyno biribû, bedewî... Te yê bigota hew li Zeyno dihat bedewî...

Êdî guliyê zerê hunandî, ku xortan digot bila kindira sêdara min be bes bila ê min be, xwe bernedida ser qolincê, por tev rûçikîbû, rûyê wê yê wek taveheyva ku li şeva reş der bibe tev qerçimîbû, êdî ewqas xweş nedibişirî.

Xelkê ku behs dikir digot, em zanin zeman gelek tiştan dibe, merivan li gelek poşmaniyan dihesilîne, carinan dike ku tiştêk êdî bê vegeer diçe, lê xwezka bedewiya jinekê ewqas jê nestanda!

Diranê wê yê ku te digot qey ji mircanan in, hûr hûr di ber hev de bi hostatiyeke Xwedayî şîn bûbûn gelek jê ketibûn. Carinan xwe bixwe digot hew diran mabûn, ew jî çûn.

Hecî Qadir digot Zeynoka min ez ê te bibim diransazekî baş, diranê te ji berê xweşiktir çêbikim. Digot, lê bes gotin; îro, sibe, duşemê, înnê, hefteyeke din û tim taloqkirin. Êdî ketibû devê gundî û cîranan; dema ku karekî xwe pir serî lê bigerandana, taloq bikirana digotin: Ooo va karê me bû çêkirina diranê Zeyno!

-Zeyno! Zeynebê... Ma ez ji birçîna mirim, ji do de pariyek nan te neda...

Mêrê wê şiyar bûbû dîsa, pitepita wî... hûrdêlikê cîrnexweş... Bi dengêkî xemgîn got:

-Va ye amade dikim hela sebir bike carê! Û bi hêrs kir nirçenirç.

Li hêwanê sifreya xwe raxist û tişt yek bi yek anî li ber danî; tasek şorbe, pîvazek dîlîmkirî, kevçî, çend têl şinahî, nan, xwê... Û li hember rûnişt, nikarîbû nan bixwara, dilê wê nedîçûyê, dêya xwe difikirî dîsa.

Di bin çavan re li mêrê xwe dinihêrî, çawa şorbe fir dikir, di dilê xwe de got: *Yekî nizanibe ew ê bêje qey çend roj e ziqûm nexwariye yan jî ji ber xelayê flitiye, çi ye.*

Zeyno qet ji mêrê xwe hez nedikir.

Piştî ku temen bûbû çil û pênc Hecî Qado jî êdî li taliya Zeyno difikirî û digot:

-Hema hinekan bihata bixwesta, bila biçûya ser qismetê xwe.

Zêde wext derbas nebû eqrebayekî Hecî Qado yê ji zû de koçî Îzmîrê kiribû û di demek nêz de jina wî miribû, hat xwazgîniya Zeyno. Bavê wê vê carê zêde dirêj nekiribû û dabûyê.

Hecî Qado dîsa dest bi derewan kiribû:

-Ez ê nizanim çi qas zêr, gustîlk, kembera zîv, daîreyek û nizanim çi bikirim.

Rojekê cîrana wan xaltiya Xezalê çûbû mala wan, Zeyno jê pirsîbû: Xaltî, ma bavo benek di guhê min re kiriye dibêje ez ê ji te re daîreyekê bikirim, eceba rast e, bi ya te wê bikire? Xazalê gotibû:

-Qîza min, te xweş xeber e, lê min ne bawer e. Ma kê diye li vî welatî li vê erdnîgariyê kesî piçek ji mal daye qîzan!

Tilîlîlîlî, tillîlîlî... Aha telefon lê dixê! Reviya, rahişt telefonê:

-Elo, elo! Dengê min tê, haa Mistefa tu yî? Kerem'ke çi heye, rewşa dayê çawa bû?

- ...

-Te got çiiiiii! Dayê ji bin kêrê derneket, hahoooo li min rebenêêê!

Û telefon ji dest ket, bedena wê jî wek dareke hişk ji jor de hat xwarê...





ŞÊXMÛS KURT

 @SehmasKurt30

Jankuj 100 Mg. 10 Tablet

I.

di navbeyna tiştan têm û diçim
têm
û
hîç im
bi xwe nakevim!

II.

jibergotinek heye her jibergotinek
ji bayê sibehê heta tofanên fena

III.

mirov hîleyek e di wêneyê hebûnê de
kincên kêfxweşiyê li xwe kirî
gidî!

IV.

Ey, ê bêsiber li her derê!
jibergotinek heye her jibergotinek

V.

pirça rojê veçirandî
veçirandî û li mişextiyê mehrkirî
hewar!

VI.

bi sibê bawer be
bi xapandina bajarên ewle
baş e!

VII.

sîxurek têt
behsa kolanên virtûvala û romanên qerebalix diket
jibergotinek heye her jibergotinek

VIII.

min bizanîba xêr e jamkutê vî dilî
gupegup gupegup gupegup gup!

IX.

di dawiyê de her kes welatê yekî dî ye
jibergotinek heye her jibergotinek

X.

sebr bikin!
bîstek dî dinya nîn e
bîstek berê nîn bû!

jibergotinek heye

her

jibergotinek hebû!





MEHMET EMÎN CÎRÎK

@mehmet_emin_crk

PÎREBOKÊN QUBALEKAN - II

Ji bo mamosteyê min ê hêja “Remezan Alan” ku ev qad bi min bêhtir dabû hezkirin.

“Ez erfîdek im. Cin im yanê. We xelet nebihîst, na. Cin im ez. Ji min re dibên Gerrok Ibn Pitat. Yanê gerrokê kurrê Pitat. Ewê xeberxweş! Geştgîn im ez. Guhdêr û çavdêrek, na guhkun û dîdevanek!...Heger we hinek çav li kitêban bigeranda, na we guh bida çîrokên bav û kalan...‘nixumandî’ ne...Kirasek hatiye ser me...hûn me nabînin...Goristanên rûzer, newal û geliyên bêsewt, serşo... Şeytên... agir... Kê bi çavê serê xwe dîtiye ku me di zêstaniyê de zarokên xwe yên seqet û dînik bi yên we yên jîr guhertiye?...Em jî diqehirin, şa dibin, digirîn, dikenin, hez dikin, dixwin, dizên û elbet dimirin...”¹

1 Ev bend ji destpêka romana Remezan Alan a bi navê Saturnê hatiye wergirtin.

Ji nişkê ve dengê derî hate, çar xweh û birayên hev Hitto, Alya, Cîbil û Emma bi bazdankan hilkişiyar qubaleka² mezin. Xwediyê odeyê derî vekir, çente di pêyên wî de, derbasî odeya xwe bû. Çenteyê ser pêyên xwe avêt kêleka maseyê, sol ji nigên xwe derxist, çekên ser xwe bi çekên bermalê ve guhertin, şimik xiste nigên xwe û çû aliyê din. Hitto, him bi şaşmayîna pirtûkê û him jî ji tirsê dengê derî, ku pirtûk di destê wî de mabû, got: Înşelaha me nedîtiye yaw! Ez çiqas tirsiyam. Kuro! Hewqas sal in em di vê odeyê de ne, hayê me ji vê pirtûkê tune bû. Xweha wan Alya got: Erê yaw! Hewqas sal in em di van qubalekan û di vê odeyê de bûn û hewqas sal in ku em guhdêrê sohbetên odeyê bûn, tu carê kesekî behsa vê pirtûkê nekiribû. Wextê ku behsa wê hatibû kirin, qey em di xewa mirinê de bûn?

Cîbil: Law we dît ku di pirtûkan de çawa qala me dikin? Me digot qey bi tenê di şevbihêrkan de qala me dikin. Camêr di vira de qala tiştên ecêbtir kiriye kuro! Xilafî tune ye weleh. Rast gotiye helbet. Erê, xuya ye ku camêr li ser pir şixuliye. Lê ev destpêka kitêbê bû. Divê em vê kitêbê çêre bi çêre bixwînin ka mine hela çî derdikeve rastê. Bi rastî jî her çiqas destpêk be jî, zimanê wê bi min wilo îronîk hate. Ma bav û kalên me wilo diştexilîn? Ma hema em bêne ser xwe, belkî sed, sed û pêncî sal in ku em di vê jûrê de ne, em bi du zimanan diştexilîn. Zimanê me ewilîn suryanî bû, piştî ku suryanî mecbûr man ji gund bar bikin, bû kurmancî. Heya niha jî em bi piranî kurmancî dipeyivin. Belkî ji ber ku êdî sohbetên bi zimanê suryanî neman. Helbet van demên dawîn erebî, axlebe jî tirkî pir ketiye nav zimanê kurmancî ku îman lê çikandiye. Em bi xwe jî li gorî ku bi tirkî nizanin, hevokên me di bin tesîra hevoksaziya tirkî de maye. Bi xêra xwediyê odeyê hinekî zimanê me li ber hev hatiye.

2 “Qubalek” di malên Mêrdînê yê kevin de wextê ku xanî têne çêkirin, di hundirê malan de, bi taybetî piştî wan li rojhilatê dinihêre. Ji sê heban pêk tîne. Jora wan gilover e, jêra wan rast e, dirêjokî ne. Ya nîvekê li gorî yê kêlekên xwe mezin e. Di hin malan de du heb bi cam in, yek ji wan bê cam e yanî bi deriyê text ve qufilandî ye. Berê, kevaniya malê di ya qufilandî de firax û alavên xwe yê taybet vedişartin. Ji lew re berê ji dêleva dolaban bi kar dianîn. Van demên dawîn, di yê cam de, pîrek cihêz û rihelên xwe didin nîşandan. Ji bo xemilandina jûrê û ji bo wextê ku pîrekên nas û taxê bîn, bibêjin cihêzên filankesê - bêvankesê çiqas pir û xweşik in haho! Niha jî hin kes (nola min) pirtûkan di wan de tije dikin. Qubalek ji pirtûkan tîne ku bihedimin, ji bo ku heval û hogirên wî bîn; bibêjin çiqas pirtûkên te hene law! Û li kêlekên jûrê jî qubalekên mezin hene ku ji wan re beyfirêşat jî tê gotin ku xwediyê malê livînên xwe têdixin wan.



Emma: Kuro ma qey li hemû civatan geriyaye, dibe ku bîranînên zaroktiya wî bin?

Hitto: Na looo! Ma we nedît, di hin civatên odeyê de derheqê me de geh digotin yên ji me çêtir, cin; zarokên wan digotin bihok, yên ku perde li ser wan e... filan û bêvan.

Cîbil: Îcar tiştên ecêbtir ew e ku te dît carekê yekî ji yên din re digot pîrebok çima niha li rûyên însanan dernakevin? Yê ku li miqabilî wî rûniştibû, ku emrê wî 60 bû, digot ji ber ku însanên niha şeytan in cin di rûyên wan de dernakevin. Însanên berê saf û li ser rûyê xwe bûn. Ji ber vê yekê, cin hebûn. Çi tiştêkî beredayî ye ne wilo? Ma va ye niha jî em hene, em bixwazin em karin însanan cinûnî bikin. Ma gelo însanên niha bi qasî me dikarin xwe ji ber hinan veşêrin? Ew qabiliyet bi kîjan însanî re heye?

'Alya: We dît carekê yekî li odeyê digot ku cin berêvarkî derdikevin axlebe li bin darên guhîjan hene. Dema min şivantî dikir, min bi çavên xwe ew dîtine.

Ev çend roj in min dil dikir ku çîrokekê binivîsim, lê ji ber hayê min ji çîrokan tune bû min ceger nedikir li ser klavye û bi qelemên ko quretiyan bikim û çîroksaziyê beredayî bixuliqînim. Helbet, sedema wê jî hebû ku min bêhtir ji romanên hez dikir. Romanan bala min dikişand. Gelek çîrokên xweş ên kurdî û yên wêjeya cîhanê di qubalekên jûra min de hebûn. Bes, min bi xweşkayî yek ji vanan jî nexwendibû. Jixwe tiştên ku ez dixistim fikaran ev bûn. Li zanîngehê, li dersê, li xwaringehê, li qantînê wextê ku ez bi hevalan re diştexilîm jî min bi xwe digot gelo ez çawa dest bi çîrokekê bikim, hewce ye ez hin çîrokan bixwînim an jî hinek kitêbên teorîk ku mamoste di darsa vegotinnasiyê de rayî me dabû û me hin piratîk jî li ser wan kiribûn, bixwînim? Min wê rojê behsa vî tiştî ji hevalê xwe re kir, got divê tu çarçoveya mijara xwe diyar bikî. Got, mesela Jean Paul Sartre

Îcar tiştên ecêbtir ew e ku te dît carekê yekî ji yên din re digot pîrebok çima niha li rûyên însanan dernakevin? Yê ku li miqabilî wî rûniştibû, ku emrê wî 60 bû, digot ji ber ku însanên niha şeytan in cin di rûyên wan de dernakevin.

dibêje ku heger meriv tişteki binivîse divê bizanibe bê çi dinivîse. Rast e gelo? Helbet, divê meriv bizanibe bê çi dinivîse. Ya min wek ceribîneke li ser çîrokeke çûcanî bû. Mesela, di romannivîsan de heger romannûs ne yekî qerase be, wê roman serî jê bistîne yan jî hinek hene ku nikarin romanê, çîrokê bi dawî bînin. Vêya ji bo nivîskar tişteki pir xetere ye. Ku meriv di hin romanên de tê dawiyê, fêhm dike ku dawiya romanê nivîskar ji hal de xistiye û bi ser neketiye. Min bihîstiye ku gelek romannûs û çîroknûs berhemên xwe nivîso hiştine, berhemên xwe bi dawî ve neanîne. Van tiştên ku ez dibêjim jî beleheq in. Belkî haya meriv ji vanan tune be jî dibe. Jixwe pîrebokên me karin bi kurmancî bipeyivin. Belkî li ser xetên cot em zimanê xwe birêsin.

Ji nişkê ve dengê berqetavan ji derve hate. Bû şirreşirra merzîban. Ez bi dengê berqetavan veciniqîbûm ser xwe. Ez hinekî cemidîbûm û gêjomêjo bûbûm. Çi xewneke ecêb! Sobe temisîbû. Ez rabûm, min çend êzingên zirav ên berûyan avêtin sobeyê û hema wilo min ji xwe re li derve, li baranê nihêrî.





EMERÎKÊ SIDÎQAYÊ

@emerikkkk

XATIRXWESTIN

Werdekek hewl dide xwe da ku bikaribe di binê behrê de şopa xwe winda bike. Du qaqlîbaz li ser rûyê avê wawîkên evînê dinivîsin. Çilapek li ser belgên zer diçûrsin. Kevir dibiriqin bi halê min û payîza min dikenin. Senfoniya ba û baranê lawijeke aram dide sewta qijika ku di nikulê xwe de kakilê gwîzê digêrîne.

Tora masiyan, keştiya bayê (barê wê xem) babirek (dilketiya bagerê) pêlên şid, kendalê herifi, kefika gerînekê (di xwe de çerx dibe), şeytanok, qaqlê guhê masiyan, reqa yekalî, guzîka hişk (yadîgara tîrmehê), direkî dara guhîcê, dara gezo...

Hesinekî zengar di nav sêlexaneyê de, hesinê şaristaniya me, di hundirê min de diqurife. Bi qirêjiya xwe ve dimirim. Ez çima dimirim!

Bêhna kevwê, belgên dawşiyayî, ba, bager, behr... Çikulên stûxwar û jar ji mirinê re bîreke xwerû çêdikin. Mirin bîra dinyalêgê... Ji her tiştî xatir dixwazim. Xatirxwestinek heta qiyametê pê ve bi ku ve diçe...

Heçko ez ji xatirxwestina payîzê têm. Li ser serê min ewr, di dilê min de xemên ewravî, ne sîwarê hespê bayê me, ne jî sîwarê hespê baranê me... Rêberê min belga berûyê ye, ji welatê bejî ye... Li dû me kastekasta bayê. Barê min bi xeman dagirtî û giran im, -bizarêm ji xeman- ez ji xwe jî ji bayê re fenanî belgeke zer im. Kêliyek şûnde çûncika min, ku her payîzê çilspî dibe, şil û pil dibe, dikim bi rondikê payîzê bixemilînim.

Ev payîz, ev xem heçko ji bo min hatiye hilibijartin. Bêhna mirinê ji min û sekoya li bin min tê, ax rastî û hebûna mirinê çiqas hişk e... Dirizim di nermahiya xweliyê de, xwelî xwe li tenêtiya min dipêçe. Diwestim, ra-

diwestim guhê xwe didim weşandina belga zer. Sal, wext ji xwe dipirsim ez li kîjan dinyayê disekinim? Dinyaya min payîz e... Çenga xwe di xweliyê de dikim, dibim herî, vediguherim heriyê! Dengê dil dibêje: Tu hatî dawiyê! Li vir di navbera hebûn û tunebûnê de yî. Tenêyî, tenêtiya bêaso, çavê te kasikê xwînê. Jiyan di awirên te de di paş de vedigere. Kenê min, giriyê min û dêya min tèn bîra min. Danê esrê li qiraxa vê behrê rûniştîme şipavan dijmêrim, hesabê xwe dibînim. Di hişkesaliya mirinê de gavên xwe, reva xwe, meşa xwe dipîvim. Wextekî, zaroktiya min a bêguneh hebû, min li ku derê û ji kê re hişt?

Dem qiblegeha kal û pîran e, ez ê li dergehê vê payîzê bimirim. Nizam min kengê û çima xwe da ber bayê xortaniyê, li ber dergehê vê dinyayê. Hevalên min kevokên teqlebaz. Dem vediguhere lîlavekê, tê de gut bûme, diponijim, mejiyê min keviyekî seqî. Pêjna bayê mirina siya spî li peleguha min. Hatim dinyayê...! Tême dinyayê...! Tune dibim! Bêhna sêvên tirş li ser singa min, xwe diavêjim bextê devbeleşiya xwe. Di dengê min de sewta min, xwe winda dikim. Pûç dibim, di keviya xwekuştinê de pûşê şîreme me. Tu xem nîn e ji rabirdûyê, hêvî qusiyane ji dahatûyê. Dikim xwe ji bîr bikim, lê taqet tune ji filitandinê re. Tenêtiya pîr valahiya tîr dîl digire. Çirkeçirka demjimêran e, ezman hildiweşe ser serê min. Xwediyê dilekî vala me, pala xwe didim bayê payîzî, boş û betal im li ser sekoyekî li ber devê behrekê. Zaroktî rijiyaye ber nîgê min, ez ê xortaniyê li ku çal bikim. Dersdara min qijika belek e. Ji xwe dihesim, li xwe vedigerim, deng li min dibihure, li ber dergehê dilê vê payîzê parsekek im. Tava şermok ji min re çav diqirpîne, ax xeyala gerbûnê... Li vê dinyayê xeyalên min her ku ew bûn, dicemidîn! Li rûyê min dîmenên payîzê... Çavên min di awirên min de, sebra Xwedê di hundirê min de ediliye...

Terka xewneke windayî dikim. Dizanim êdî bext qirşa lêmiştêkê ye û lehiyê bijangên min di ro de bir. Xir û xopan e hezkirin; min ji bo xatirê janê, xwe lê ceriband. Li valahiya tarîtiyê wer dibim. Di bin siya tava tenêtiyê de li parsûyê xwe digirim. Mûyê parçemokan rûyê min mist dide.

De tu ji nû ve vegere! Bi wê meşa xwe ya çivîkan ve ji nû ve vegere! Nehêle, bila balindeyên reş pinûk çenekin li ser dilê te. Tu bi xatirê rondikên çavên kalan ji nû ve vegere, de tu zanî di rondikên kalan de bêhna pîroziyê heye, ji kirêtiya mirovan re ji dêvla Xwedê ve rondikan dibarînin. Were ji min re qala qalûbelaya dil bike.

Masîgirê kal bi rondikê çavan ve sebra min e, bi sewta ahilê (extiyar) ku di bin dilekî têkşikestî yê cahil de mayî ve ji min re dibêje:

Wer meke, wiha meke loo!

Ji min re qala evînê meke loo!

Payîz zîz dibe, xwe li rûyê min direşîne...

Payîz 2015, Erdîş



KAWA NEMIR

 KawaNemir1

Helbestkar

Pirsî: "Tu li ser çî yî, li ber çî yî?"

Go: "Ez karê xwe dikim ji bo mirineke geş."

Bê text û bext, her wext, rê û rêbarên bagerê,
Di dêst de hefsarê venegerê, hiltîne' b lez,
Qonaxên bextê sext, zê û zêmarên zehf berê,
Zeft dike, tîne ji zozanên 'heyf, dûr û derez.
Bi tevdana ku bayekî bêqeyd-bend tev dide,
Wan bîrên di hundirê wî de dilewlibîne,
Ji sewtên ko, yên kulcivatên xedar bê rade,
Dikişê ser rûpelên zer, bi hêrs, kînekîn e.
Çi kes e ew? Zehf, zehf dexes e ew li ber sêhrê,
Ya ku tim dizê ji maka bedewîya berwext,
Bi kaw û kubarî vedijî ji qîr û qehrê,
Perestgeha şadîyê ava dike, pîrr serwext.
Paşwext navê xwe dikole' l ber ba, talîzokê,
Pêkol e' l hişê gel, ew siwarê bablîsokê.

Sermaweza 1996an

Stembol

Kawa Nemir, Mêrdîn
© Roza Erîzîn

Qers

Şêrîntirîn xewa Mirinê, lihêfa berfê,
Ku dinixême navmîla Kurdistanê delal,
Li bakurê serê min ê mayî li ber qerfê,
Li kû yên dêl ketî nava lîngan mane kerr-lal.
Qersê! Di nav kulîyên berfê re tê dengê sê,
Rê-olaxên Te girtî ne ji Qulpê û pê de,
Ta ku bibihêm sewta Fêrikê berk û asê,
Gujeguja ku tê ji Têkorê û ji wê de.
Jê pê de Êrîsa nêzîk û geş diçirûse,
Di nava dol û gelîyên gewr re tèn xuyanê,
Ew asîkên Yêrêvanê, çi Hay e, çi Rûs e,
Bi çavê zarokatîyê, dinalim ji janê;
Jana ku lûrikên min tîne'j xewa Mirinê,
Hêwa ku dibare, tîne berfa sewta dinê.

*Nîsana 1999an
Îdir*



KOÇER BÎRKAR JI BO CIWANÊN KURD DIBÊJE:

HERÇENDÎ WELATEK WE TINE BE JÎ BILA ARMANCEK WE HEBE Û LI PEY WÊ BIÇIN

HEVPEYVÎN: SARA OGURLU, MAMO ÎSSA, BÎLAL ATA AKTAS

Koçer Bîrkar, di 2018an de xelata Fieldsê ya matematîkê wergirt ku wek Nobela vê beşê tê hesabandin. Gelek kurdan jî cara ewil bi vî hawî navê wî bihîst. Tevî axaftina xwe ya xelatwergirtinê û sekna xwe ya kurdewarî, Bîrkar bû qehremanê kurdan. Rêya ku ew jê derbas bûbû bo me qet xerîb nebû. Ji ber şert û mercên xerab ên Kurdistanê Îranê berê xwe dabû xerîbistanê û bûbû penaberek. Xaniyê ku tê de çêbûye, mehla wî, derdora wî hima biçî ku derê tabloyek e ji hezar tabloyên li Kurdistanê.

Boneya çalakiyekê, me ev zanyarê kurd li Parîsê qefalt, digel kêmasiya wextê dîsa jî em şiyar çend pirsan jê bikin.

Kovara Bar: Koçer Bîrkar bo cenabê te navekî çawa ye, em dizanin ku te ev nav hê paşê ji xwe re wergirtiye. Gelo bo çi te ev nav hilbijart?

Koçer Bîrkar: Koçer, bi mirovekî dibêjin ku ji cihekî bo cihekî din koç dike û li cihekî nasekine û bi awayekî berdewam digere. Bîrkar jî bi mirovekî dibêjin ku mijûlî karê bîrkariyê ye. Koçer Bîrkar bi gotineke din tu dikarî bêjî ew kes e ku wek koçerekî di cîhana bîrkariyê de xerîkî karê bîrkariyê ye. Kesek e ku di nav dinyaya bîrkariyê de digere.



B: Sala 2003, hêj temenê te 25 salî bû, te transkrîpsiyona Dîwana Qani' kiriye, ew latîniye kiriye. Bellî ye ku te hewes bi edebiyatê jî heye. Gelo meraqa te ya edebiyata kurdî çawa ye, te pêwendiyek çawa heye pê re?

K: Ez bi giştî ji ziman hez dikim û bi raya min zimanê kurdî zimanekî bi-hêz e û dikare gelek tiştên baş pê bîn nivîsîn. Rast e, zimanê kurdî di warê zanistî de gelek bi pêş ve neçûye; lê di warê wêjeyî de zimanekî bihêz e û bi zimanê kurdî mirov dikare gelek tiştên ciwan binivîse. Min bixwe jî berî ku biçim zankoyê min helbest filan dinivîsîn; lê niha ew nemane, ji nav çûne. Ez niha jî ji zimanê kurdî di warê hunerî de hez dikim û dixwînim. Bo nimûne helbestên "Nalî" bo min zor xoş in. Ciwankariyeke (estetîk) zor kûr tê de heye. Tu dikarî wek hunerekê lê binêrî. Helbestên Qani' jî ciwan in, lê aliyê civakî zêdetir tê de heye.

B: Gelo anha çawa ye, derfetên te çêdibin ji bo xwendinê?

K: Kêmtir, ne, mixabin. Yek, ji ber ku dem gelek kêr e ji ber kar û mal û jiyana zarokan, ya din pirtûkên wan bi zehmetî peyda dibin. Li cihekî weke Kemberîcê ku ez lê dijîm kitêbên kurdî li kitêbxane û kitêbfiroşan gelek kêr in.





B: Ez pîrozbahiya bidestxistina xelata cîhanî li we dikim, serfirazîyeke mezin bû ji bo me, lê pirsyar ev e ku gelo jiyana Koçer Bîrkar berî wergirtina xelatê û piştî wergirtina xelatê çawa ye? Bandor xistiye ser jiyana te? Gelo ev xelat xala werçerxê bû ji bo cenabê te?

K: Bandor dixê, lê eva ku ez di warê bîrkariyê de dixebitim tu têkilî bi xelat û medalyeyan ve nîn e, ji ber ku min di dema nûciwaniya xwe de dest avêtiye karê bîrkariyê, wate di temenê 12 û 13 saliyê de mijûl im heya niha. Lewra xelat ne girîng e û ez ê ji niha şûn de jî li ser bîrkarî û lêkolî-nên di vê qadê de berdewam bim. Lê xelata ku dan min, mirov li cîhanê tê naskirin û mirov dike kesayetiyeke cîhanî û eva jî başî û rindiyên taybet bi xwe hene. Weke vê ku dikarî karê zêdetir bikî, alîkariyên zêdetir bikî, weke ev projeyên ku min behs jê kirin digel zanîngehên Herêma Kurdistanê û bi alîkariya wan, rêxiraweyekî akademî bo kurdan ava bikin. Niha ku min xelat wergirtiye, hêsantir ji berê dikarim wan karan bikim. Berî xelatê min di vê qadê de xebat dikir, lê serkewtî nebûm, ji ber ku tu kesî guhdarî dengê min nedikir. Bi giştî xelatê başî û xirabiyên xwe hene û eva başiyên xelatê bûn. Lê xirabiyên xelatê jî eva ye ku name û mailên zêde ji min re tên û eva jî dema min dîkujê, ji ber ku li Kemberîcê wek Almanyayê me sekretêr nîn e.

B: Te behs kir mamoste, te got te çend şîr ji nivîsandine. Gelo çîrokên te jî hene? Tu hêj wan xweyî dikî di kitêbxaneyâ xwe de?

K: Mixabin nemane, ji ber ku min bi başî neparastin.

B: Baş e, lê çîrok?

K: Na, min ew jî tune.

B: Tu berî çend heyvan li Başûrê Kurdistanê bûyî, we çî projeyên xwendinê bo zanîngehên Herêma hene?

K: Me ji bo hemû xwendekarên kurd li her dereke cîhanî proje hene, wate proje taybet bi herêma Kurdistanê nîn e, ji ber ku Herêma Kurdistanê hikûmeta xwe heye û dikare alîkarê xwendekarên xwe be.

B: Têkiliya we bi xwendekarên kurd re çawa ye? Tu wan dişopî-nî, mîsal haya te ji xwendekarên kurd ên li Brîtanyayê heye, ew qet tîen cem te?

K: Belê, têkilî hene. Gelek ji wan name û mailan ji min re dişînin. Sala ji 2006an heta 2010an min malper-ek bi navê “Korî Zanyarî û Dahênan” hebû ku taybet bû bi xwendekarên kurd. Armanca min jî ew bû ku ez xwendekaran han bidim ku li ser mijarên bîrkarî û fîzîk û pîzîşkî kar û



TRANSKRÎPSIYONA QANI' :

«Min dixwest her vê gavê bikaribim herim ser gorê Qani' û min ê jê re bigota xem neke, kurd jî dikarin pêş bikevin. Min ê jê re bigota Qani' te li ku derê aşvanî dikir, Koçer Bîrkar jî li wê derê ji dayik bû, li wir hîni hizirîn û fikirinê bû, li wir meraqa matematîkê pê re çêbû, min dixwest herim kêlê wî maç bikim û jê re bêjîm êdî bi aramî razê.»

Ev xebat di sala 2003an de hatiye amadekirin û ji 80 rûpelan pêk tê, ji bilî pêşgotîneke bi îngilîzî, nêzî 75 helbest û şerxên helbestvan Qani' dihundurîne. Bi gelemperî em dikarin vê xebatê weke xebateke tîpguhêzî (transkrîpsiyon) bi nav bikin ji ber ku çavkaniya sereke û tekane ya vê xebatê, dîwana Qani' ye ku sala 1979an ji aliyê kurê wî, nivîskar û wergêr Burhan Qani' ve bi zaravayê soranî û tîpên erebî hatiye berhevkirin û çapkirin ku ji jîne-nîgarî û hin bîranînên wî û nêzî 350 helbestên wî yê cûr bi cûr pêk tê. Koçer Bîrkar li gor heman xebatê Burhan Qani' û bi heman şîroveyên wî, 75 helbestên mamoste aniyê û bi zaravayê soranî û alfabe ya latînî carek din nivîsandine.

Têbînî : Spas bo hevkarîya Kanî Cîhangîr, Rêbîn Mihemed û Mevlûd Oguz.

lêkolînan bikin û pirtûk û kovaran bixwînin û piştê ji 10 heta 20 rûpelan namîlke, têzekê binivîsin. Ev karê me pir baş bû û me di heyama 4 salan de pitir ji 100 endamî kom kirin. Lê piştî 4 salan karê me sist bû û min malper daxist. Ji niha û şûn de ez ê careke din di vê mijarê de bixebitim.

B: Têkiliya te bi welat çawa ye mamoste? Tu dikarî herî Merîwanê cem malbata xwe?

K: Mixabin, ez nikarim vegerim Merîwanê. Dayik û bab û xizmên min li Merîwanê dijîn.

B: Dema te xelat bi dest anî, te got “Hêvî dikim ku gelê kurd bi bi-destxistina xelata min kêfxweş be.” Te bi çi mebest û hestekê ew gotin anîn ziman? Gelo bi rastî gelê me kêfxweş bû? Kêfxweşiya xwe gihandin we?

K: Di rastî de di warê saykolojiyê de xelata min bo gelê kurd girîng bû. Ji ber ku bi dirêjahiya dîrokê gelê kurd hatiye tepeserkirin. Welatên dagirkar hewla guherîna kurdbûnê didin. Di 90an de li Tirkiyeyê rê nedidan ku gelê me bi zimanê kurdî biaxive ji bo ku bi vî awayî zimanê kurdî ber bi nemanê here û di rastiya de armanc ew bû ku miroveke din çêbikin. Lewra ji bo gelê kurd girîng e ku bêje ez jî heme. Hewce nake ku mijar jî siyasî bê kirin. Bo mînak, li welatekî weke Fransayê dikarî kurd bî û hevdem hemwelatîyekî Fransayê jî bî. Dikarî şanaziyê bi kurdbûna xwe jî bikî û weke hemwelatîyekî Fransayê jî jiyana xwe bikî. Niha heq bû ku me weke gelê kurd bikariya li Îran û Tirkiyeyê kar bikira û hevdem şanazî bi kurdbûna xwe bikira.

B: Em dixwazin rûtîna te ji hîn bibin mamoste. Rojeke Koçer Bîrkarî çawa derbas dibe? Saet di çendan de radibe? Çi dike? Her roj diçe zankoyê?

K: Di rojê de nêzî 8 saetan kar dikim, birek li mal e û birek li zanîngehê. Lê piştî bidawîhatina dema kar, tev li zarokê xwe dibim. Ji ber ku hez dike digel min yariyan bike û tiştan ji min fêr be. Wate dema min bi karkirin û digel zarokê min derbas dibe.

B: Bo pêşerojê çî projeyêke bîrkariyê we heye ku taybet be bi gelê kurd? Piştî vêya tu bûyî wek rockstarê kurdan, çavê kurdan li ser te ye. Tu yê çawa bikî ?

K: Ez ê li ser projeyên xwe yê bîrkariyê berdewam bim. Lê eva ku têkilî bi gelê kurd re heye eva ye ku dixwazim rêxiraweke weke Akademiya Nêtworêkê ava bikim bo xwendekar û mamosteyên zanîngehan. Wate taybet dibe bi qonaxa zanîngehê. Dixwazim wêbsaytekê ava bikim da kesên ku mijûl lêkolînan in, navên xwe tê de tomar bikin û bînan nasandin û xwendekar jî peywendîyan bi wan re ava bikin û mamoste rênîşanderiyê bo wan bikin.

Herwiha em dixwazin ku salane bûrsê bidin çend kesan. Yekem car em ê bi pênc kesan dest pê bikin. Mimkun e paşê zêdetir bibe. Em ê bûrsê bidin wan xwendekarên kurd ku gelek baş in.

B: Ji bo bûrsan xebat hene?

K: Belkî siberojê çêbe.

B: Weke Koçer Bîrkar çî dibêjî gencên kurdan?

K: Ez dibêjim wan ku bawerî bi xwe hebin. Heke kurd bin û xwedî welatê xwe jî nebin, dikarin xwe perwerde bikin. Herin zanîngehan û lêkolînan bikin. Armançekê di nava mêjiyê xwe de çêbikin û piştî li pey armanca xwe biçin, eva gelek girîng e.


B: Koçer Bîrkar ji kîjan film û pirtûkan hez dike? Ji kîjan stranbêj û bajaran hez dike?

K: Gelek in, bi yek û dudoyê çênabe (dikene), lê ez ji filmên dokomên-tarî û komêdî hez dikim. Ji mûzîka cîhanî hez dikim. Di stranbêjên kevn ên kurd de ji Hesên Zîrek hez dikim. Ji hunermendên niha jî ji Behcet Yehya hez dikim. Di kurmancî de jî ji Ehmed Kaya hez dikim ku koça dawî kiriye. Zor in yanê, zor hene.





DEWRÊŞ SANCAR

 [sncr_abdullah](#)

Nûcan

Şikeftek hildiweşe wa ye di hindurê min de.
Findek jê diçe û demsalek diqede.
Tu dengê payîzê yî Nûcan!
Bi bayekî hênîk re ji zozanan bi fikefîk têtî.
Di geliyê tarî de dergûşa zarokekî fileh dihejînî
Û xwe li hindurê min dipêçî.


Guh bide Nûcan!
Li ser kendalekî asê dayikek 16 salî, bi kum û kolosê xwe yê bûkaniyê disekine.
Bermahiya zarokatiyê ye rik û ronîya di çavên wê de, bi hev şa dibin.
Evînen ferfûrîn dişikên di destê hûtê kambax de.
Tu bi sî û sê zimanî pak î,
Ez gunehkarê çar kitêban im.

Binêre! Bi rengê hineya her du keziyên te diherikin du çemên pîroz.
Te nalînên xwe di destara hêrsa xwe de hêraye.
Bi hêsirên xwe hevîr kiriye û bi loriyên zarokên newelidî meyandiye
Lê...
Te di tendûra dilê min de bi germahiya agir, evîna min pêjaye Nûcan.
Ka bêje ji min re: Evîna te mezin e yan hêrsa te?



MENAHÎL SEHEWÎ

JI EREBÎ: EMİN METİN

 **emin.metinn**

Min Tu Doh Dîtî Tu Dimirî

Bêgav im, gere ji xew rabim weke mîheke giran
Ku aciz bûye ji razandinê li ser guhanê xwe yê şîr-tije


Bavo, dixwazim ku tu bizanibî şer çizirî hundirê min
Mejiyê min veguherî wekî gayekî har
Aramiyê datinîm ser xwe
Ji bo ku kurm dernekevin ji guhê min

Bavo, dengê te bilind e ema guhê min piçûktir e ji tevliheviya min
Min tu doh di xewnê de dîtî
Tu dimirî
Û hinek tişt ji te diketin
Min ew top dikirin, mirovekî din çêdikir ji wan
Te xwe pêxember dihesiband, min bawerî dianî bi te
Mezin bûm, min fehm kir ku bexîl e Xweda
Tenê aliyên hevpişk ên min û te bavo
Em her du jî dizanin hîleya Xwedê
Ji bo viya bû xemgîniya wî
Îro, bavo, tu wek êşeke har dişibî Xwedê
Û ez nikarim rûyê asîmanan tamîr bikim bi helbestan
Xwedayo! Tu dizanî ez ji bo çî kîndarê vê hîçbûnê me
Ji ber ku tu bavekî baş nebûyî
Û bavê min her roj dikir ku xwe bişibîne te.





MUSTAFA ÇELEBÎ

 [cigara_ber_baye](#)

Xêz:
Mustafa
Çelebî

QERETÎ

Zevî li jora gund, nêzîkî dêrê û li ser serê girekî bû. Nava wê rast, lê derdora wê tev berwar bûn. Genimê lê çandî êdî zer bûbû. Wextê ku meriv li zeviyê dinihêrî xetên genimî mîna tejê emeniyekê rêz bûbûn. Qeretî ji dûr ve dixuya. Desmaleke sor dabûne dora serî mîna wan şêxên berê yên bi heybet, qapûtekî reş î pînekirî lê kiribûn. Ew der wisa bêdeng bûn, tenê dengê xişexîşa simbilên genim, wîtewîta çivîkan û dengê kêzikan dihat. Xwediyê zeviyê ew ji hinek darên rizî çêkiribûn, her texteyek ji darekê bû û ji cihekî hatibû, temenê hinekan mezin ên hinekan jî piçûk bûn. Wan her sê mehên biharê ancax hînî xwe bûbû. Bizmarên ku li milên wî xistibûn sist bûbûn, wextê ku dihejiya zîqînî ji textikên wî dihatin. Milekî wî ji destiyê bêrê çêkiribûn, bi wê bêrê jî rêx hatibû avêtin ku hîn jî bêhn jê dihat. Lingê wî ji rexderiyekî çêkiribûn hîn dewsa zurzeya dêrî û qirêja destan a bi salan li ser hebû. Jixwe lingekî wî tenê hebû. Wê rojekê miheqeq ji hev derketa. Lê ev tişt ne di xema wî de bûn. Milên wî her tim vekirî bûn û li xaçê dêrê di-



nihêrî. Bawer im tişta herî li xweşa wî diçû ev bû. Ku bikaribûya bi rê ve biçûya belkî 'qesta derê dêrê bikira'¹.

Ew ji bo ku ajalan bitirsîne di nava zeviyê de çikandibûn, lê nikaribû kesî bitirsîne û her tim serê xwe dixiste ber xwe, guh nedida vê fikrê. Di-ponijî û li ser pêyan di xew re diçû. Qijikan jî genim dixwarin. Xwediyê zeviyê paşê anî, kirasê jina xwe lê kir, go belkî pêşa dêreyê lê ba bibe û qijik bitirsin. Şemaqiyêke Diyarbekirî da serî. Çend kiras lê guherîn, kê dihat kirasek lê dikir... -Axirî dîsa anîn qapût lê kirin, lê vê carê milê qapût kurt bûn jê ra. Feyde nekir, qijikan dîsa genim dixwarin. Qijikên ku teze bi firê ketibûn berî ku merivan bibînin ew nas dikirin, hînî wî dibûn û lewma jî ji merivan neditirsiyan. Heta ku merivekî kewkiyek li wan nexista û berneda wan...

Havîn xilas dibû, êdî baranên payîzê dest pê dikirin. Şeveke reşeba û ji aliyê din ve jî dengê ewran dihat. Rengê ewran wisa bû ku meriv jê ziravqetî dibû, reş mîna qîrê. Ev ewr hêdî hêdî ber bi gund û ber bi zeviyê ve dihatin. Wextê ku şiliyê² dest pê kir û bû qirçe-qirça ewran, pêşiyê rûyê wî şil bû. Libên baranê wisa li pozê wî diketin çawa ku yek wî bide ber sîleyan. Milên wî jî neditewiyan ku bi pêşa qapût rûyê xwe paqij bike. Ava xwe di desmala li dora serî re dabû der, di patika wî de hêdî hêdî diçû xwarê heta ku di delingê re biavêje. De êdî wisa bûbû stara sa hebû, ya wî tune bû. Ji nişkan ve bi pirtepirtekê qijikekê li ser milê wî danî. Bayekî pêşa qapûtê wî li hewa xist, li hev aland û bilind kir. Te digo qey wê niha bifire, lê ne deng ji wî derket ne jî qijik jê tirsîya û revî. Ev qijik hînî wî bûbû û mîna barana ku danê xwe bigire, her roj ber bi esrê dihat.

Qijika ku her roj dihat li ser milê wî datanî qeretî jê re qe dey nedikir, xwe 'ker dikir guhê xwe didayê. Wextê ku qijik distira zehf şa dibû. Carinan paleyên genimî kevir diavêtine qijikê:

-Evê mîratê guhê me bir heyra!

1 Risteyek ji şî'ra Şêxê Sen'anîyan a Feqiyê Teyran

2 Baran



-Xwedê jê razî evî qeretiya bigire, biavêje, bi kêr nayê, wa tu nabîna qijik tîn li ser datînin...hindik maye hêlûnê li ser serê wî çekin.


Qeretî di dilê xwe de go:

-Wey li ser serê min!..

Roj bi roj qeretî hînî wê dibû. Lê hîn rûyê wê nedîtibû ji ber ku stûyê wî nedizivirî. Zehf meraq dikir û zehf jî hez dikir ku rojekê wê bibîne. Her gava ku qijikê li ser milê wî datanî kelexwihê pê digirt, dibû terpeterpa nava wî, hindik dima ku ji hev derkeve. Wextekî pê hesiya ku dilê wî ketiye qijikê. Êdî zevî ji destê qijikan çûbû helakê.

Piştî wan rojên biewr tav derket, bi tavê re her der ronî bû. Wextê bêderan bû. Li pala pêşberî qeretî gulek hêşîn bûbû. Roj bi roj gul geş dibû.

Xêz:
Mustafa
Çelebî



Hema wisa dixwest ku wê gulê biçine, bide qijikê, lê nikaribû bitewe û destê xwe biavêje gulê. Rojekê dêna xwe dayê teyr û tû tev koç dikin, diçine welatên germ. Qijik jî tev wanan diçe. Ew hesret ma di dilê qeretî da.

Qijik diçe perê şehrekî dûr va, dêna xwe dide, malên wisa bilind serê merivan ji ber gêj dibe... Ew jî difire, diçe nava çarşıya wî şehrî û hêlûna xwe li ser serê *Türkü Barekê* ava dike... Navê xwe jî datîne "Karga".

Em dîsa vegerine gund... Wan rojana jî keseyê dêrê kurê xwe zewicandibû, daweta wî bû. Gede wisa ji Şahê Bedo hez dikir, xeyala wî ew bû ku rojekê wî bibîne. Çawa kasêtên wî derdiketin diçû, distand. Axirî ew anî daweta xwe jî. Roja dawetê li gund qîrîn û qûjîn e, kes kesî serwest nake, heçiyê ji gundê derdorê bihîstine ku Şahê Bedo tê dawetê, hatine. Gund wisa qelebalix e millet ser hev û ber hev re diçe. Wê şevê wisa leyîstine tiliya qilîçê ya çend heban ji cî derketiye. Tiwaleta mala keşe jî li derva û berê wê li aliyê zeviyê bûye. Wextê ku Şahê Bedo kûpikê desmêjê hildide diçe ser avê, dêna xwe didê wê, dengê tê '*Gula çiya ax gula çiya, t'ez helandim ax gula çiya, rengê te çima tarî bû, wî ez bimrim ax gula çiya*'. Pir jê tesîr digire, evê nalîna dilê qeretî dixê kilam. Seva xatirê qijikê, qeretî dil nedida³ ku li gulê binihêre. Êdî ew bûbû gula ber bêhna wî!

Rojekê wextê ku Şahê Bedo diçe wî şehrî, li wê *Türkü Barê* distirê. Ji nişkan ve deng diçe qijikê, agir bi kezeba wê dikeve, dibe pirepira hêsirên ji çavan re diavêje. Cigare namîne dikişîne, şerab namîne vedixwe... Dikeve kuçe û kolanên wî şehrî, dibêje ez ê di gora bavê xayê vê heyatê nim! Rojekê dêna xwe dide, wêneyên wê li dîwaran dixin. Meraq dike, diçe ji wana dipirse "Qurban hûn kî ne?" "Em anarşîst in". Paşê digihîje wanan. Ew jî dibe anarşîst. Paşê dîsa navê xwe dike qijik. Li asîmanên wî şehrî dikeve, belkî carinan tê ser pencere û balkonên we diziyê dike, haja we jê hebe.

3 Dil nedan: Qêmiş nekirin

Qijik diçe perê şehrekî dûr va, dêna xwe dide, malên wisa bilind serê merivan ji ber gêj dibe... Ew jî difire, diçe nava çarşıya wî şehrî û hêlûna xwe li ser serê *Türkü Barekê* ava dike... Navê xwe jî datîne "Karga".





BAHA AKHAN

 @akhan_baha

HEVOK - 1

Ji *te re...*

Çavên te li wî sernavê çîrokê ket û te piştre dest bi xwendina vê hevokê kir. Jiyan xerîb e xwînera/ê min. Min ev hevok nivîsand û vêga tu jî vê hevokê dixwînî. Min û te, me qet hevûdu nas nekiriye û di xewnekê de jî em pêrgî hebûnên hev nehatine. Lê va ye di navbeyna min û te de pirek û pêwendiyeye xurt heye ku ew jî bi saya serê vê hevoka ku tu niha dixwînî pêk hatiye. Tenê tiştêkî dizanim ku ev pêwendiya di navbeyna min û te de bi xêra vê hevokê ye. Kêngî te dev ji xwendina vê hevokê berda, dê ew pir hilweşe û tu yê car din noqî nav jiyana xwe bibî. Tu çima vê hevokê dixwînî nizamim û pêwîst nake ku ez sedema wê jî bizanibim. Ji bo ku ez binivîsim tenê xwendina te besî min e.

Ez dê di vê hevoka ku tu niha dixwînî de, xwe bi te nedim nasîn. Jixwe naxwazim xwe bidim nasîn. Lewre ev hestiyariya tenik divê di navbeyna du kesên nenas de be. Werhasil... Ez dê niha ji tereçîroka xwînera/ê xwe vegêrînim. Navê xwînera/ê xwe jî ji terenebêjim dê baştir be, lewre min ji wê/wîreli ser serê xwe sond xwariye û naxwazim ji serê xwe bim. Gelo em dikarin navê cenabê te li xwînera/ê min bikin? Hiih? Navê te çi be

bila navê xwînera/ê min a/ê ku ez ê çîroka wê/wî vegêrînim jî heman wisa be. Ger ku te navê xwe li xwînera/ê min kiribe êdî ez dest bi çîroka te bikim.

Çend roj berê, min di kovarekê de çîrokek nivîsandibû. Min di wê çîroka xwe de bi awayekî ku ez bi terebiaxivim dest bi vegotinê kiribû. Min tu nas nedikirî, lê min dizanîbû ku tu yê wan hevokên min bixwînî. Min di çîroka xwe de behsa kûçikekî purtşîn kiribû ku çîrok wiha bû:

Li welatekî gelekî nêzikî te û gelekî dûrî Xwedê û li gundekî bi navê gundê te de... Ew sê roj bûn ku kûçikekî dixist kastekast û direyî û nedihîşt tu kes rakeve.

Duaya Kûçikekî

Li welatekî gelekî nêzikî te û gelekî dûrî Xwedê û li gundekî bi navê gundê te de... Ew sê roj bûn ku kûçikekî dixist kastekast û direyî û nedihîşt tu kes rakeve. Nemaze piştî banga ‘eşayê hetanî banga spêdê dinaliya û direyî. Gundiyar nikanîbûn deriyêd guhê xwe ji vî dengîrebigirtana. Heta bi şev li goristana gund jî mirî ji vî dengî ya star dikirin û car din dimirin. Gundî heyirî mabûn û nizanîbûn ka dê çi bikin. Belê, her şev dengê nalîn û reyîna kûçikekî dihat û kûçikêd din jî li pey direyîn. Ji ber ku nizanîbûn, ditirsiyan û dixwestin çareseriyek bê dîtin. Rojekê mixtarê gund, gundî li mizgeftê kom kirin da ku ji vî pirsgirêk û tirsêreçareyekê bibînin. Piştî nimêjê, bi serokatiya mela û mixtarê gund, pirsgirêk hat nîqaşkirin. Ji her seriyî gotinek derdiket, her yekî li gorî xwe rewş şîrove dikir û dinirxand. Yê ku digot: “Berket ji gund dûr ketiye û ev jî şeytên e ku dikeve qûna kûçikan û yariyêd xwe bi xêr û berketa me dike (ev kes mela ye).” Yê ku digot: “Êş e li nav kûçikan belav bûye divê hemî bêtin dermankirin (mixtar).” Yê ku digot ji ber daxwaza rizqêd xwe wisa dikin, yê ku digot û digot... Mela ji bo çareseriyê jî digot ku:

-Divê hemî gundî bi ser hişêd xwe ve werin, nimêja xwe bikin, zikat û fitrêd xwe bidin. Jixwe ji Remezana par ve tu kesî fitrê xwe û zikata xwe nedaye mizgeftê.

Mixtar rabû û got:



Ceribandin - Cîrok

-Ez bawer im ku ev êşek e ku di nav heywanêd me de belav bûye. Jixwe tebeq ketiye nav dewaran û ev nexweşiyeyeke din e ku bi kûçikan girtiye. Dibe ku xeternak be. Divê em lê miqate bin. Hûn bixwazin ez ji Weysiyê kurê xwrebibêjim bila bê li heywanan mêze bike.

Ji nav cimaetê yekî di ber xwe de got:

-Jixwe dewarên me yên ku qet nexweş nebûn jî kurê te nexweş xist bo ku pênc qirûşan zêde bistîne kurê kerê. Êja dora kûçikan, segê kurê segê!

Her kesî li gor xwe tiştek got, lê di mala Xwedê de li hev nedikirin û hîn jî nizanîbûn ka dê çi bikin. Kî ji wan rast dibêje? Di wî gundê bi navê gundê we de kalê herî temenmezin Heş Tahir bû. We Heş Tahir parî kiriba dê diwazdeh zarokên deh salî û zarokekî heft salî dê ji temenê wî derketa. Heş Tahir her çiqas ê herî kal bûya jî hîn li ser xwe bû. Heta ku zêde giran nexweş neketa ji nimêja mizgeftê nedima. Tenê milê Heş Tahir ê rastê di şerî de ji 'enîşkê ve jê bûbû. Dema ku Heş Tahir ev rûdana li gund bihîst, her wekî ku tiştek hatibe bîra wî ji cihê xwe rabû, bi lez ber bi derî ve meşiya. Berî ku bigihîje derî, mela jê pirsî:

-Hecî! Ez xulam tu yê bi ku ve biçî? Heş Tahir, li ser milê xwe yê qop ve zivirî û bersiva pirsê mela û çavêd cimaetê da:

-Sibehê piştî nimêja nîvro car din top bibin û ez ê ji we re pirsgirêka we bibêjim, lê divê ez niha biçim û ihtimala vê ramanê di serê xwe de bidim tekûz kirin. Heş Tahir, li pey xwe deriyê mizgeftê girt û ket ser rêya ramanên xwe. Hey diçû û hey dixist pitepit. Di ber xwe de digot:

- Jixwe ev çend roj bûn Hecî Memê qet nedihate xuyan. Divê min pê derxista ko... Hiih gelo? Heş Tahir bi wan raman û noqteyên vala xwe gihand ber derê mala Hecî Memê.

Hecî Memê nêzî sîh salî ji Heş Tahir biçûktir bû, lê di wan salên dawiyê de bûbû hevalê gelek nexweşiyên dijwar û nema dikarî ji mal derketa. Heş Tahir bang li malê kir: "Hecî Memê ka tu li ku yî?" Bersiva Heş Tahir bûka Hecî Memê da: Kerem bike Hecî, Hecî nexweş e di nav cihan de ye. Heş Tahir çû ber serê cihê Hecî Memê û dema ku çav pê ket bi xwînsarî ramiya: "Teqez tişta ko ez hizirîm rast e." Dema ku Hecî Memê dît ku Heş Tahir diponije çend dilopên hêsiran ên gelek kevin xwe ji ser dêmên wî berdan

xwarê. Diyar bû ku Hecî Memê ji mêj ve ye negiriyaye. Lewre ew çend dilop hêsir bi dijwarî ji çavêd wî ketin û bi dijwarî ziha dibûn. Hecî Memê bi dengê giran û zîz got: “Heş Tahir ev sê roj in ku bi min re dinale û bi min re direyê. Tu kesekî qetek nanê tîsî nedayê. Hew tê li ber paceya min û bi min re dinale. Her wekî ku dizane ev demên min ên dawiyê ne.” Çend dilopên din jî li ser dêmên Hecî Memê xuya bûn. Hecî Tahir lê vegerand: “Nexwe tu dizanî ko ez ji bo çi hatime. Her kes ev sê roj in ko vê rûdanê diramin û xeber didin. Dizanî Hecî, me sed sal li pê xwe hiştin. Bîr bûye pîneyeke riziyayî êdî.”

-Belê Hecî, ev hê du rojêd min in ku ez te dipê. Xêncî te tu kes vê rastiye nizane Hecî. Te ji min re bavîti kir. Qenciya te gelekî ghişt min. Hecî êndî ez ne bawer im ku ez sax ji nav vê lihêfê derkevim. Bawer bike naxwazim derkevim jî lê...Ev henaseyêd min ên dawî ne Hecî. Li ber paceya min e, lê ez nikarim destê xwe dirêjî wî bikim.

Piştî axaftinek dûr û dirêj Heş Tahir rabû, derket derve. Kurê Hecî Memê, Reşat hat, kêfxweşî da Heş Tahir û li derve qasekê rûniştin. Heş Tahir ji Reşat pirsî: “Kurê min ka ew kelbê we?” Reşat, bi awayekî seyr li Heş Tahir nihêrî: “Li van deran e ez xulam. Bo çi te pirsî?” Ji nişkê ve kelbekî pûrtşîn û mezin, lê ewqas jî kal ji pişt xanî ve xuya bû. Dema ku kelb xuya bû û ber bi Heş Tahir wan ve hat, Heş Tahir rabû ser pêyan û bi serê xwe silav lê kir. Kûçikê pûrtşîn jî wekî Hecî Memê çend dilop hêsirên xwe ji ser dêmên xwe ve berdan xwarê. Dev û lêvêd wî kelbî ziha bûbûn. Reşatê kurê Hecî Memê li vê rewşa Heş Tahir heyirî ma û kir ku sedemê wan tevgeran jê bipirse. Heş Tahir beriya wî jê xwest ku piçek nan û avê jê re bîne, were. Reşat çû hinek nan û av anî, Heş Tahir nan bi avê nerm kir û da pêşiya wî kelbî. Dema ku kelbê pûrtşîn zûr li nav çavêd Heş Tahir nihêrî, Heş Tahir jî xwe negirt û ji sindoqa hêsiran çend dilop rijandin ser rûyê xwe yî boz. Heş Tahir, Reşatê kurê Hecî Memê û ew kelbê pûrtşîn li pey xwe hişt û çû. Sibeha din piştî nimêja nivro cimaeta doh car din civiyan hevûdu û li benda Heş Tahir man. Heş Tahir di dest de qutîkeke biçûk ve hat, li navendê rûnişt û cimaetê jî çerxek li dorê vegerand. Heş Tahir ji qutîkê çend wêneyêd gelek kevin derxistin û dest bi çîroka xwe kir: Nod û neh sal berê... dema şerê Tentenqelê. Dewletê li seranserî welat seferberî îlan kir û ji nav



Ceribandin - Cîrok

milet leşker berhev dikirin da ko biçin eniya şerî û ji bo rizgarkirina dewletê şer bikin. Ew çax ez û Îbrahîmê bavê Hecî Memê û çend kesêd din ciwan bûn. Di mabeyna bîst - bîst û pêncan de bûn. Îbrahîm ciwanekî qeşeng û bedew bû. Dilê wî ketibû keça melayê gund. Keçikê jî zehf jê hez dikir. Heta Îbrahîm çend caran dê û bavê xwe jî şandin xwazgîniyê, lê mela keça xwe nedida Îbrahîm. Îbrahîm dixwest ko çareyekê ji vî derdê xwe re bibîne. Ditirsiya ko dê keçikê bidin kesekî din. Her ko roj diçû di seranserî dewleta gewre de şer xurttir dibû. Çend eniyêd şerî yên nû vebûbûn. Gelek miletan serxwebûna xwe îlan kir. Bûn xwedî dezgeh û rêveberiyêke din. Eşîran jî serî hildabû. Îbrahîm jî di wê baweriyê de bû ko divê miletê me jî bibe xwedî dewlet û sazî û reveberiyêke aîdê me. Digot: Qewmê Esman jî bi hejmara xwe ya kêmbûn xwedî dewlet, lê em, qewmê Erd, bi vî hejmara xwe ya zêde hîn jî ji cihê xwe neliviyane. Werhasil tiştêd ko me qet nebihîstibûn ji me re digot. Behsa çend kesan dikir, digot nizam Mehmedek heye ji bo qewmê Erd gelek tiştên xweş gotine û çend sal berê wî jî ev tişt bi lêv kirine. Me nizanîbû ko Mehmed kî ye û me nizanîbû ko em dê çi bibin. Dewlet gund bi gund leşkeran berhev dike. Îbrahîm bûbû pêt û nedisekinî. Îbrahîm nedixwest ko leşkerî bike û dixwest ko em birevin, biçin çiya. Ev agahiyêd derbarê Îbrahîm de, digihîştin ber destê melayê gund jî. Rojekê melayê gund piştî nimêjê bang li Îbrahîm kiribû û pê re axivîbû. Behsa wî şerê dewleta gewre dikir û dipesinand: Kurê min ev dewlet xelfetî nûneriya dînê me dike li hember gawiran. Ger ko îro em li vî dewletê xwedî dernekevin em dê li cem Xwedê gunehkar bibin. Û nizanîm êdî çi gotiyê. Mela, dike nake bi serê Îbrahîm nakeve. Mela dizane ger ku Îbrahîm neçe leşkeriyê gelek ciwanên gund dê bidin pey wî û dê biçin çiya. Ji ber wê mela ji Îbrahîm re dibêje were ez keçika xwe bidim te. Ew agirê evînê car din di dilê Îbrahîm de gur bûbû. Dema ko melayê bê dîn û îman dana keça xwe li Îbrahîm kir Îbrahîm ramiya. Erê qurban, hezar heb welatê te hebin jî û tu du hezarên din jî ava bikî tu carê nake welatek ji evînê. Evîn e yê ko te bi welat dike û evîn e yê ko te bê welat dike. Îbrahîm biryar da û gotina mela pejirand. Dawet hat lidarxistin û zewicîn. Lê Îbrahîm her tim digot: “Ez bûm kûçikê ber deriyê melayekî. Diewtim û hew ji bo ‘ên din’ diewtim.” Werhasil jina Îbrahîm ducanî bû dema ko em çûn leşkeriyê. Ew çû eniya Tentenqelê ez çûm eniya Wasewasê. Îbrahîm mêr bû û camêr bû heyran. Qet nebe bi lêv

dikir, digot ez kûçikê ber derê kesekî me û qet nebe wî ber xwe de digot û qet nebe tişta ko pişta wî şikênand evîn bû. Lê ez.! Lê me!. Em nikarîbûn bibûna kûçik jî. Tu tiştî pişta me neşikand, lê me pişta xwe da şikênandin. Piştî ko em çûn çendekî, di şerekî de ez birîndar bûm û bi vî milê xwe yê qop vegeyiam ber derê mala bavê xwe. Ez nezewicîbûm jî hîn. Kesekî nedixwest keça xwe bide yekî qop. Heyran min xwe dikuşt bo ku ez bibim kûçikê ber deriyekî. Û bû jî. Du sal piştî hatina min Îbrahîm jî vegeyia. Lê di nav rewşeke gelek xerab de bû. Tiştinên ko li wî alî dîtibûn li ser wî poşmaniyek peyda kiribû. Dema ko vegeyia kûrek jê re çêbûbû û navê wî kesî ku behsa bi dewletbûna qewmê Erd dikir li kurê xwe kiribû. Hema digote min: “Tahiro ez bûm kûçikê ber deriyê melayekî.” Bi her henasewergirtinê re digot: “Ez bûm kûçikê melayekî” û di her henaseberdanê de jî heman tişt. Çend salên xwe tenê bi vî hevokê derbas kir. “Ez bûm kûçikê li ber derê melayekî”. Êdî ne dixwar ne vedixwar. Hew ew hevok bû ya li ser zimanê wî. Heta ko şevê dema ko razên ji jina xwe re dibêje: “Ez bûm kûçikê ber derê melayekî” û dema ko jina wî spêdê hişyar dibe dibîne ko di paxila wî de kûçikek pûrtşîn. Jina wî têdigihîje ev lavahiya mêrê wê ya ji Xwedê ye. Îbrahîm bû kûçikekî pûrtşîn.

Hûn dê bibêjin ka çawa dibe Heş Tahir? Ne gengaz e tiştêd ko tu dibêjî? Bi serê we kim û bi vî serê xwe yê sed û bîst û heft sal e wêrekiya kûçikekî jî nedaye nîşan bikim ko dibe. Li welatekî gelekî nêzîkî we û gelekî dûrî Xwedê û di gundekî bi navê gundê we de...dibe. Niha ew kastekast û reyîna ko ev çend roj in nahêle hûn razên, wekî razekê û dengêkî naletî sed û bîst û heft sal in li ser dilê min zeng digire. Ew nalîn û reyîna ko nahêle hûn razên bêdengiya sedsalan e. Qêrîniya bêkesî û eşqekê ye. Ya dîrokekê ye ko li ber serê we digirî. Feryada dîn û îmana Îbrahîmê ko bû kûçikê melayekî ye. Êşa tûleyekî êtîm e. Daxwaza Xwedê ya ji bo we ye.

Deriyê mizgeftê ji lavaiyeke sedsal bere re vebû. Reşatê kurê Hecî Memê ket hundir. Ji melayê gund re got: “Seyda bavê min çû ber rehma Xwedê.”

Reşat, li ser Heş Tahir ve zivirî û domand: “Hecî, kûçikê me yê pûrtşîn jî mir.”

...dûmahîk heye...

Ceribandin




Xêz: Mustafa Çelebî



ŞÊRZAD HESEN

LATÎNÎZEKIRIN: EKREM YILDIZ

 @ekoyildiz

MALÊK LE AW

Serokî xêll zor be pele her hemû xêllekanî ko kirdewe û pêy witin: “Êwe her hemûtan dezanin ke ême lem dergeye da gîrman xwardûwe, çend sall carêk jimareman ziyad deka, wa em sallîş wek nerîtî baw û bapîran mercehendiktan amade bin û bibine qurbanî Xudawend, awaş nebê ne xorak beşman deka û ne ew xakey le serî dejîn, wek caran hendêktan dexeyne nêw belemêk û bê sewal detandeyn be dem awewe. Xoşbext e ew kesey debê qurbanî, her lêrewe... ke le kenarderyawe firrêman dane naw gêjelûk û şepolekanewe, îdî lew berkenarî ew dîw dêne derê û lew dunya degene ber demî Xudawend û jiyanêkî ta ebed xoş çawerêtan e, wek debînin wa em sall hem jimareman ziyadî kirduwe û hem xorekman rû le kemî ye, le pall qurbaniyanî pîr û pekkewte gerek e çend kurr û kiçelawêk xo teyar biken bo seferî ew dunya bû bibine qurbanî.”

Le ber dem merg be xinkan her hemûwan doş da mabûn..

Serokxêll helîdaye:

“Ger wa bê... naçar im wek hemû carêk xom qurbaniyekan helbijêrim.”

Sereta her hemû ew pîrejin û pîremêrdaney ke seyran le gwê qebir da delerzê lew şiwêne da rîz kiran ke şepolekan serî xoyan be taşberdekan deşikand.





Xêz: Mustafa Çelebî



Be dirêjayî ew wexte serok, qurbaniyekanî rîz dekird ta nore hate ser kurr û biçelawekan ke le jêr xoretawî girbaranî ew roje da firmêsk û areqeyan hellderîşt.

Be derêjayî ew wexte kurr û biçêkî 'aşiq bêaga le merg û xinkan û le qurbanî û le guşad bûn be dîdarî Xudawend û le birryarî nabecêy serokxêll çawyan le yekdî birrîbû, pirrşengî xor le ser leşî ebenûsî herdûkyan şepol dedayewe û le şiwênêk da le ser awî derya, de nêw boşayî asman, le ser xak da be yekdî debûn.

Diwacar serok birryarî da diway qurbanî hellbijêrê, destî xiste ser şanî kurrey 'aşiq û xenka û de nêw çawanî dillxwazekey da.

Yeke yeke xizane nêw belemî şeçuşirr, bê sewal be awa da deran. Diwa qurbanî kurrey lewend û 'aşiq xiraye nêw belemêkî çikole û kon têbû da, ta le çawan win bû awirrî le kiçe dayewe, taw taw şepol şêtaney kenarder-ya ke detwit le daxî em lêkdabirrane serrî xoyan deşkênin lêkdî birz dikin.

Her hemû xêll be dem sema û hera û zena û qirîşke û hawar û çirîkey sitranewe ruwew jêr kepirekan gerranewe. Takekesêk ke cê ma be ser berdêkî lûs û xizî rûxaney deryawe kiçey 'aşiq bû ku detwit zeriyeve taze le away zerya derhatibû, ber lewey kurrey 'aşiq de nêw temî derya da win bê, kewte diway şepol cêdaw û ke fikirdû le belemî toqîw, lerzîw de nêw gêjenî derya da, kewte diway bonî cêdaw... kewte diway tamî firmêskanî kurrey lewend... şiwên pêyekanî... bew umêdey ke le jêr derya da be yek bigeyn, her zû her du pêyekanî ke le ser berdeke xizî... zorî 'aşiq hêdî hêdî bergî awî pûşî le qule pêyewe... ta ejno... paşan kemer û ta bin memikan... diwacar wek gulle-etllesêk kewte ser aw û şepolekan ruwew belemî nequmbûy kurrey 'aşiq nermesemayan pê kird... lewê... dûr le çawanî bedbînî serokxêll û her hemû xêll... le jêr derya da malêkî xencîlaneyan le mirwarî û mercan dirust kird... dîwar aw û... serban aw û... şûre aw û... derga aw û... pencerekanîş her le aw.. ta henûke wa le wên... du 'aşiqî awî wa le wên!

Silêmanî, 1999





SIMEYA

 @simeyaxan

Stranek ji bo Jinên Bêtiwîng

Stranek bo jinan, herfên wî dêya min didirû
Awirek didim jiyana xwe, berê xwe nadimê
Ev yek
Merheba jiyana min
Ji payîzê dinivîsim
Porên min dirêj nabin
Ev payîz sedsalên wî wînda
Bayê stranekê tê
Ba, li ezmanan kufik girtiye, deng jê nayê
Heya dawîya dinyayê vûûûûûûûûûû
Bi hezaran zarok vûûûû
Bi dehan jin vûûû
Goreyên xwe li xwe dikin, werin, bimeşin, bêhn bikin
Navek daynin li vê sedsalê
-navê min li her cihê şiyar e-

Mêrg, Rhineland, berêvarî, ve'l asr, bikene
Bazinek ji diranên filên mexmûr, ji nav bajarên dûr
Life, life is all right on the Rhine*
Hêsirên te li ser pêsrên te
Ev didu

Beriya her tiştî nameyek ji dêya min re
Dêya min
Lehîfan didirû ji kulan, ji kul û meraqan
Dêya min
Xwedê difikire, li ber tendûrê
Dêya min
Di bin siya xwe re derbas dibe wexta digirî
Her jin wexta digirîn dibin dê
Bayê stranan, tivingek, tirseke bi gupe gup
Şil dibin li ber derî

Na, pişîka reş e li ber derî xêr anî
Ziravê Lîn qetiya navê xwe danî
Jin im, dimirim
Sêv min xwar, mar min anî
Parsûyê Adem NaLîn jê anî

Demsala sêyem e, gur ji pirçên xwe bêhizûr e
Şîrê biyan dimije
Radike serê xwe ji nav biyan, li esmanan dinêre, halelujah
Hûn sê jin bibînin şerek tê bîra we
Dêya min
Ez te bibînim şerek tê bîra min
Ev herfên germ bi xwîne hatine şuştin
'Ez naxwazim bimirim'
Zivistanên zûhatî, daristanên rûxemgîn, leşkerên ji pişîkan hez dikin
Dimeşin li ber mirina xwe



Min li ber her baranê dest bi stranekê kir
Guhanên baranê hebûn
Min li ber her baranê tiştêk winda kir

Hovîtiya behrê, rengê avê, di binê balîfa min de çemek derbas dibe
Xewna E'yê dibînim. E, xweşiktir e ji hejîrên ber baxçeyê dêrê
Av, ey xêza mirin û jiyane
Av e, bendav e, lehî ye
Gulistan e di nav de wenda ye
Gulistan, porxeleka strana bayê
Dikene li ber ava Munzurê
Şev e
Tenê destekî min heye, nivîştan ji hev vedikim ebcêd hewwez
Ez li ser kuştina xwe difikirim
Jin im

Nameyek ji sedsalê re
Bi destekî dinivîsim destekî min tune ye
Hêviyan çêdikim ji dêya xwe re
Ez, li vir, şeva payîzava, li vir
Karkera hezkirinê me, tivinga min heye

*Straneke ji koma Beyrûdê

SEDSAL

REHMÎ KURDZIMAN

 @kurdziman_

Lamya hevala min e. Hevala min a polê ye. Keçikeke ereb e. Porê wê çûr e. Bejna xwe bilind, çavên xwe reş, wekî qetranê ye. Laşê wê tekûz e, tu yê bêjî qey Xwedê hemû hunera xwe di wê de bi kar aniyê. Pêsrên dagirtî, qalçeyên gilover û şidiyayî û, û lêvên mîna pelê titûnê tenik! Ax, her ku ez wê dibînim yekser dixwazim wan pelên titûnê bimijim, bidim ber kit û gezan!

Îro roja yekşemê ye. Ji ber ku Lamya zimanê tirkî baş nizane, mamos-teyê edebiyata klasîk em her du kirin grûb û îro em ê li zankoyê li ser lêkolîna xwe bixebitin. Niha ez hema bêje li ber derê zankoyê me û Lamya bi bejna xwe ya bilind, bi çîpên xwe yên wek xameya ku Shakespeareî pê şanoyên xwe nivîsîbû pîroz, li hêviya min bû li ber deriyê kantînê.

Min go:

-Silav Lamya, hevala min a delal. Tu çawan î gelo?

Bi ken li min vegerand:

-Ez baş im û hêvîdar im tu jî baş bî.

Piştî hevhemêzkirinê em çûn li ber tavê, li ser bankê rûniştin. Mijara me ya lêkolînê li ser “Wêjeya Tirkan a Klasîk a Sedsala 15an” bû. Mîna ku min gotibû, Lamya zimanê tirkî baş nizanibû û loma jî em niha ligel hev bûn. Ewê, pirtûk rûpel bi rûpel ser hev de werdigerandin û min jî, min jî bi



tenê li wê, li pêşîrên wê, li xameyên Shakespeareî dinihêrî. Li derdora me tu kes tune bû. Yê ku hebûn jî ji me dûr bûn. Loma bêyî tirs û fedî min ji xwe re li horiya ku ji nav Baxê Îremê daketibû ser rûyê vê erdê, dinihêrî.

Çend hûrdem derbas bûn û hêj em di halê xwe de bûn. Bi gotineke din ew li kitêban hûr bûbû, ez li pêşîr û çîpan. Ji nişka ve Lamya serê xwe

-Heke te ji min hez kiribe, heke tu niha jî ji min hez dikî û di pêşerojê de jî tu yê ji min hez bikî, ha wî çaxî payîna min a li hêviya hatina te ya rayê, sedsal be jî demeke kin e.

ji nav perên kitêbê bilind kir û li min nihêrî. Wî çaxî min got qey ewê hemû ramanên ku bîstek berê di serê min re derbas dibûn bê îstîsna tev xwendin. Ez hebek li nav hev ketim, lê bi pirsra wê re hebek bi xwe ve hatim:

-Sedsal çî ye?

Min bi navekî din jê re got ku têbigihîje: Esr e, qurn e.

Mîna ku bi vê bersivê ne qayîl be, dîsa pirsî:

-Sedsal bo te çî wateya xwe heye?

Min go:

-Yuzyil, ango esr, qurn, sed lib sal... lê ev bi zimanê min ê malê ne.

Dîsa got:

-Wekî din?

Min lê vegerand bêyî ku li mebesta wê bifikirim:

-Demeke pir kurt û dibe ku demeke pir dirêj be.

Li nav çavên min nihêrî û dîsa min got qey mejiyê min dixwîne, min got qey dixwaze hemû nepeniyên min hîn bibe. Pirsî:

-Çawan?

Min jî li nav çavên wê nihêrî û çawan ku wê dixwest mejiyê min bixwîne, min jî bi heman tevgerê li wê nihêrî û ew bersivand:

-Heke te ji min hez kiribe, heke tu niha jî ji min hez dikî û di pêşerojê de jî tu yê ji min hez bikî, ha wî çaxî payîna min a li hêviya hatina te ya rayê,

sedsal be jî demeke kin e. Lê heke tu niha werî rayê û em bibin ên hev û bi hev re bin, ne yek, sed sedsal jî ji bo min wê demên kurt, pir kurt bin.

Zûr bû û li nav çavên min nihêrî. Di cî de xwest rabe here û ji min dûr bikeve. Lê min jî di cî de destê xwe yê rastê xiste nav ranên wê yên ku ava bihuştê jê diherike. Bi ketina destê min re her du hêtên xwe li destê min da hev. Û çawan ku leşkerê serhildêr bi teqandina berika xwe ve, dawî-tirîn leşkerê dijmin jî radixe erdê û radihije alaya niştimanê xwe da ku wê bibe li ser xaka pîroz a welatê xwe yê ku bi dehan sal in di bin destê dijmin de bû de biçikîne bi kelecane be û vê kelecane ewqas çavên wê kor kiribe, bi qasî ku nikaribe leşkerê dijmin ê ku li erdê birîndar e û ev demeke dirêj e jî berê lûleya tivinga xwe ber bi singa wî de kiriye nebîne û bi teqandina guleya leşkerê dijmin re dibêje ‘ahh’ û serpişt dikeve, wê jî bi heman tonê, mîna ku ew gule ne li singa leşkerê serhildêr, lê singa wê ketibe dibêje:

-Ahhh!

Bi vê “ahhh”ê re şeqên xwe ji hev vedike û destê min ê ku kêlîkek bû di nav ranên wê de dîl bû û bi vê dîliyê jî serbilind bû, bi azadiyê ceza dike.

Niha em her du jî li nav çavên hev dinihêrin û paşê jî li derdora xwe dinihêrin. “Gelo kesî em dîtin?” Lamyayê ji min pirs kiribû. Min lê vegerand:

-Dîtibin jî êdî çû.

Lamya qasek li nav çavên min, li pêsîrên min, li çîpên min û li qalçeyên min nihêrî û got:

-Hevala Semra, ya baş em herin mala me, li wir em ê xweştir li dersê bixebitin. Li vir nabe.

Û em niha ber bi mala wê ve diçin û ez di çavên Lamyayê de şehwetek ji ya xwe jî berztir dibînim.

10ê Mijdara 2017an Antalya



MICAHÎD IŞIKOGLU



luxetmemorias

DOGVÎLLE: TOLHILANÎNA BEXŞANDINÊ

Derhênerê Dogvîlleê (2003) Lars von Trîerî, wek derhêner û bîrewer di nava rêbaza “dogma 95”¹ de cih girtiye. Dûre ji vê rêbazê qetiyaye û sînemaya xwe bi teknîk û zimanekî resen ava kiriye. Sînemaya Lars von Trîerî, xwediyê binyadeke dijraber û manîpulatîf e. **Di filmên Trîerî de, ku Dogvîlle jî yek ji wan e, rêwîtiyeke ber bi xwezaya dilê mirov ve heye. Xwezayeke ku têgihên wek qencî, xirabî, bexşandin û mexrûrî di kefteleftekê de ne ku ser û bin ji wan re nîn e.**

Dogvîlle, filmê sereke yê sêyîneya “Warê Fersendan - Emerîka”² ye û li bajarokekî (qesebe) piçûk ê ku film navê xwe jî jê hildaye diqewime. Fîlm ji prologek û ji neh beşan pêk tê. Di fîlm de ji bo avahiyan tu dîwar nehatiye bikaranîn û di şûna wan de tenê xêz hatine kişandin. Bi saya vê yekê temaşevan dikare rik, xirabî û rizîna nîrxên mirovî di hewayeke çîksayî de



bi awayekî şilftazî bibîne. Ev teknîk û şêweyê ku ji bo film hatiye bikaranîn atmosfereke teatral diweliidîne wek ku mebest eşkerekirin û jiholêrakirina tixûbên di navbera şano û sînemayê de be.

Karakterên sereke ya vî filmê Grace (Greys), ku Nicole Kidman bi lîstikvanîyek derasayî niwandîye, ji bavê xwe û ji jiyana bajarî direve, xwe diavêje bextê mirovên Dogvîlleê. Bavê Graceê mirovekî bihêz ê serokê gangsteran e, dixwaze keça xwe jî bike hevpara karên xwe û tehma bikaranîna “hêz”ê bi wê bide hesandin. Lê Gracea ku bavê xwe bi mexrûriyê sûcdar dike û li cem mirovên Dogvîlleê ku wan wek mirovên qenc û pêbawer dibîne, disekine. Şexsiyetên vî bajarokî dûr û bêdeng, bi têkiliyên Gemeînschaft³ jiyânên xwe yê yeknesak bi rê ve dibin. Ji ber vê hindê deriyê wan, ji kesên biyanî re, bi taybetî jî jineke wek Graceê bedew û nazenîn ku dikare bi awayên jihevçuda midaxeleyî xwezayên jin û mêrên Dogvîlleê bike re, girtî ye. Lê bi saya Tomê ku rêberê exlaqî yê vî bajarokî ye û navçîtiya Gracea biyanî û Dogvîlleian dike, ji bo ku xwe di ihtimala bihevrejîyîna bi biyanîyekê de biceribînin Graceê dihewînin. Di rojên serî de Grace alîkariya karên şênîyan dike û her tişt baş diçe, lê gav bi gav ev alîkarî vediguhere îstismar û eziyetkirinê. Ev civata ku Grace bi qencbûna wan ji dil bawer e, roj bi roj xwezaya xwe ya resen eşkere dike. Gracea ku





ji aliyekî ve, bi xweşbîniya ber bi xwezaya mirovên vî bajarokî ve peywira hûmanizmê jî bi cih tîne, xirabiyên giş ku lê tên kirin vedihewîne û wan dibexşîne. Heta mêrên vî bajarokî yên ku tecawizî wê dikin yek bi yek efû dîke û dibêje ku ev ne sûcê wan e, lê ji ber kêmasiyên xwezayên wan e.

Cudahiya di navbera tevgerên niştecihên Dogvîlleê yên beriya hatina Graceê û yên piştî hatina wê ji ber taybetmendiyê karakterîstîk a wan e. Civatên wiha piçûk û gundewar bi têkiliyên pre-modern û Gemeînschaftî tevdigerin, lê ev cûre tevger ji aliyê modernîzm û herwiha ji aliyê bajariyan ve wek nîşaneyên qencbûn û masûmiyete tên dîtin. Ligel vê yekê, hûmanîzm jî xwediyê taybetmendiyek wiha ye ku rê dide pêkhatina wehmên nirxî û pêşî li tesbîtkirina xirabiyê digire. Ev wehma qencbûnê Nîetzsche bi têgiha “exlaqê koleyan” bi awayekî serkeftî pênase dîke⁴. Li gor Nîetzsche, rewşa civatên wiha girêdayî bikaranîna hêzê ye. Û bidest-nexistina hêzê rê li ber teqlîdkirina qencbûnê vedike. Wek mînak, heman têkilî îro di navbera bajariyên modern ên tirkan û niştecihên Navîna Anatoliyayê de jî heye. Herçend bajariyên tirkan Anatolîtiyê bi nirxên çê ve girêbidin jî niştecihên Anatolî li hember biyaniyan rizîna binyada civatên xwe didin der. Bi taybetî jî ji çanda wan a lîncê ya li hember kurdan diyar

dibe ku ev cûre exlaq “exlaqê koleyan” e. Biyaniya Dogvîlleê Grace jî di sexsê hûmanîzmê de dikeve vê dehfikê û heya ku li holê tu îhtimala jiyîna bi hev re namîne baweriya xwe ji bêgunehbûna şênîyan nabire. Ev yek wek ku Trîerî bi tekiliya di navbera Graceê û Dogvîlleiyên de nîşan dide hûmanîzmê jî dixapîne û wek ku ber bi dawiya film ve jî tê peyitandin, têkçûna wê îlan dike.

Di sehneyeke bibandor a beşa dawî ya film de bi diyaloga di navbera Graceê û bavê wê de pirsgirêka derbarê mexrûrî, bexşandin û edaletê de bi aşkareyî tê ravekirin. Bavê ku ji aliyê qîza xwe ve bi mexrûriyê hatibû tawanbarkirin, ligel gangsterên xwe tê Dogvîlleê û ji Graceê pirsra vegeerîna wê dike. Grace digel hişekî xumamhêj dev ji nixê xwe yê hûmanîst bernade û dixwaze niştasihên Dogvîlleê bibexşîne. Bavê Graceê, ku wek dengê edaletê diaxive, rave dike ku bexşandina bi vî awayî tenê ji mexrûriyê mezin peyda dibe. Bi dawîbûna diyalogê, Grace li xwe vardiqile ku bi nêrîneke bajarî û modern û bi mexrûriyê bêhempa niştasihên Dogvîlleê ji mirovahiyê derxistiye. Bexşandina bêserûber, şexsiyetên Dogvîlleê hêjayî wê yekê nedîtiye ku bi xirabiyên xwe re rû bi rû bimînin û cezayê wan bikişînin. Ew nixê hûmanîst ên dûredest ku dikare her cûre xirabiyê bibexşîne di şûna edaletê de valahiyekê ew çend diwelidîne ku telafiya wê tenê bi tohîlanîneke rûxîner mimkun e. Çîroka Grace û Dogvîlleiyên wiha diqede:

Grace, ji bo ku dê û bavên wan lê temaşe bikin pêşî zarokan dide kuştin. Dûre ji xeynî kûçikê Dogvîlleê yê mayî dide kuştin.

TÊBÎNÎ

- 1 Dogma 95: Ev rêbaz ji aliyê Lars von Trîerî û çend derhênerên din ve hatiye destpêkirin. Dogma 95 rêbazeke avangard e.
- 2 Sêyîneya “Warê fersendan – Emerîka” (*Land of Opportunities* Trilogy) ji sê filman pêk tê ku Dogvîlle filmê yekem e: Dogvîlle, Manderlay, Wasîngton.
- 3 Gemeînschaft nosyoneke Ferdînannd Tonnîe ye ku ji bo tîkiliyên civatên pre-modern bi kar aniye. Li gor Tonnîe di tîkiliyên Gemeînschaftî de hêmanên wek hevnasî, malbatî û hembajarîtiyê diyarker in.
- 4 Li gor Frîedriç Nîetzsche “exlaqê koleyan” exlaqekî teqlîdî ye û ne xwediyê nixê jidil e. Binyata teqlîdîya vî exlaqî ji bidestnexistina hêzê tê û bi bidestxistina hêzê re teqlîdkirina qencbûnê ji holê radibe.





YUSIV HEMED

 @YusivHemed

BIÇIM KÛ DERÊ? PIRTÛKXANEYA BAJÊR A LI STUTTGARTÊ

Yek ji cihên ku divê mirov eseh li Stuttgarta Elman bibîne pirtûkxaneyaya bajêr e helbet. Min li ser înternetê lê nerî, illeh ketiye nav listeya 'Ecêbtirîn kitêbxaneyên ser rûyê erdê'. A rast bi tesadûfî çûbûm wê de. Ji aliyê derve pirtûkxane hewqasî bala mirov nakişîne, lê dema ku mirov dikeve hundir mirov dibêje qey di nav flmekî fikşin î Hollywoodî de ye; min hema li derdora xwe dinerî.

Dîzayna pirtûkxaneyê mîmarê Koreyî yê bi navê Eun Young çêkiriye û ji 2011an ve kitêbxane ketiye bin xizmeta gelê xwe. Ji nivê nava wê re dibêjin 'dil' û li vir mirov dikare ji wê jiyana bi lez dût keve û ji xwe re biponije. Konsepta vê odeya vala ya 14 metreyî, wek me got dilê kitêbxaneyê ye û ji perestgeha Pantheon a Romaya Kevnar tê.

Di vê kitêbxaneyaya şeşgoşeyî û 9 qatî de ji bilî pirtûkan hemû tişt spî ne. Ji niv mîlyonî zêdetir tê de kitêb hene. Di her qatê de bi mekîneyên



self-servîs mirov dikare kitêban bibe mala xwe. Odeyên bi navê ‘Scriptorium’ (nivîsîngeh-di qirna navîn de odeya kopîkirina nivîsan) hene û çî tekst be mirov dikare kopî bike. Bi van, di navbera çanda nivîsandinê ya tradîsyonel û ya dijîtal de girêdanek çêkirine.

Li qata herî jor kafeyeke xwedî panoramayeke xweş heye ku tê de însanên biasteng dişixulin. Niha nayê bîra min bê ka li kîjan qatê bû, lê li qatekê ji kitêbên zimanên din re cihek veqetandibûn. Çavê min di cî de li ‘kurdî’ geriya, bes min tiştê nedît. Ger hûn bibin abone, bi çerta xwe ya kitêbxaneyê hûn dikarin laptopên nikîtop jî bi kar bînin.

Bi roj şewqa rokê jî ji bo ronîkirinê bi kar tînin, êvaran jî bi rengên jê xweşiktir ronî dikin. Di vê pirtûkxaneyê zor hewadar de em careke din fêhmî dikin bê ka mîmarî li ser jiyana însên çiqas bi bandor e. Bi taybetî ji xwendevanên bêsebr û bêhteng re ev der derman e, lew bêhna mirov dike wek berriya Mêrdînê fireh, bi saetan eyn bînavber mirov dikare bixebite û bixwîne.



Tê Bîra Min

Ev beş
him ji bo nêzîk-
bûna hestên welatiyan him jî
ji bo hayedarbûna devok û deverên
Kurdistanê hatiye amadekirin.
Tehma edebî li aliyekî, me got
em hay jê hebin ka zimanê kurdî
li ku derê çawa têtê xebitandin. Ji
ber vê yekê, hin rêbazên gramerê jî tê de, me zêde
midaxeleyî şêweyê vegotina kevnbêjan nekir.
Wan çawa got, me jî wisa nivîsî. Em vê carê
cî didin bîranînên sê ciwanên hêja ku ji
sê herêmên cuda ne û bi sê devokên
cuda diaxivin.

Nav: Xemgîn Özçelik
Herêm: Şemrex - Mêrdîn
Temen: 21

B içûkaniya min di, tişkî ji bîra mi nari heyi. Li ew salên dûr pîreka merivkî me çû rehmetê. Meriv tev dilşikestî û bi girî bûn.

Ji bo a ku çûyi rehmetê çadira tahziyê vedibi, mêvan dihat û diçûn ez jî biçûk bûm, lê cardî jî, tahziyê di, mi çay çêdikir, çay bela dikir. Ez ewqas ji ber mevana aciz bûbûm wexta bavê mi, apê mi min didît, digo ev çi wechê teyi û dixeyidîn. Gelo carek dinê ez ê ewqas bibe-tiliyama.

Gundê me di, dengbêjkî kûr hebû, lê berî çend sala ji gund derketibû, çûbû bajarê Qezê, lê ji bo merivantiyê ew û lawê xwe rojekî hatin, lê min ew nas nedikir, ji bo min wek mêvanê din bû. Gava hatin; bavê mi, apê mi gişa digo:

-Xalê Fadil, tu bi xêr hatiye.

Apkî mi go:

-Xalê Fadil, Xwedê ji te razî bi, ma tu nexweş i, tê nehata, lawê te hatiba bes bû.



Lê mêvan go:

-Na, bavê xalê xwe, na! Di roki wanî em nêy bîra hev, em ser hev neri û nêy, me çi ji mervantiya xwe fahm kir.

Ewên peyivîn û derbasî çadira tahziyê bûn. Melê gundê me fatîha xwe xwend û silav da xalê Fadil.

Min jî bi halkî xerab çayê çêkir û bir ji mêvanê xwe, lê tişkî ecêb bala mi kişand. Di şînê di, carna ê ku hatini tahziyê giş dikenî, mi bixwe bixwe go:

-Şîn û ken!

Mi piştî çaya xwe da mêvana, çûm cem bavê xwe, mi go:

-Bavo çima vana dikenî?

Bavê mi jî go:

-Lawê mi, cêfa dil lê bi, ken jê kê m nabi.

Piştî gotina bavê mi car di ken bi mêvana ket, bavê mi ji mi'r go heri çadirê, bîskê bala xwe bidê tê jî bikeni. Min gor gotina bavê xwe kir û ez çûm hundirê çadirê, çûna mi ew çûn bû. Henekê xwe bi xelkê dikir, meseloka digot, ez ji kena derketim der, lê carna mêvan ji ber xwe fedî dikirin, lê car di nikanîbû bixwe bigirtan, dikenîyan. Mi ew wexta fahm kir ku ew Fadilê kûr i. Wexta ew ê raba car di merivên me xalê Fadil bi rê dikirin. (Fadil) yekî xerîb ri peyivî jê'ri go:

Xwarzê navê te çi yi, tu ji kê yi?

Ewê xerîb tişkî got, qey xalê Fadil nas nekir! Go:

-Ma ez ê bêji silava ji kê'ri bişîni, ez nas nakim, de heri!

Bi ev gotina, ewê xerîb li ber xwe ket. Mi di hundirê xwe di go, wele xalê Fadil te gelek eyb kir û mêvan tev bela bûn. Mi nizanîbû ez ê xalê Fadil werê nas bikim, lê naskirin gelek ecêb bû.



Nav: *Mazhar Işbiş*
Herêm: *Çingim (Varto)*
Temen: *23*



Qe ji bîra min nare, rojekî çilê zivistanê bû, sere sivê wekî her roj ez nav cîha ra bûm, diçûm alifê heywana diday, lê min çer deryê derva vekir, li der tîpîkî wer mezin hebû kî, merû nikare nik bavê der. [Li welatê me zivistana pir berf dibare, serma wî êşk e, sar e, heya bihar tê, ser çavê me gişt reş dive û diqelişe:]]

Min xwe pêçand derketim der, do êvarê da metrekî berf barîbû, navbera malê û gomê da sed û pêncî metre heye, ez heya çûm gomê bîhna min çikiya, birî û bijankên mi cemed girt, sar bû, diriciffm. Cîranê me jî mîna min alif dida heywana, mi kare xwe xilas kir, vedigeriyam malê, çav çava zor di-

dît, di dûr va da yek dixuya, li pişta wî jî çewalekî ga hebû. Waxta nîzik mi bû, min dît ku hevalê min e, dinya çiqas sar divi bira bivi, waxta me hev dît gereka em pişta du qîsa li hev bixi û em pir ser hev diket (Navê wî Miheme ye. Me ji hev pir hez dikir. Sê sal ji min mezintir e. Di vî dinê da min mîna wî xemgîn kes nedîtiye, em kînga bihata cem hev hema qala derdê xwe dikir. Dilekî pir paqîş li ser e, xortekî ciwan e. Qenderê nîv saet me qise kir

di wî navberê da dengê kûçika dihat, deng hey pê da nîzik dibû, me hey dît gurekî piştres li pêşiya me derket û direviya, qêrînê bi me ket, em bazdan ber bi malê, me gazî mileta dikir. Milet hesp zîn kir, da dû gurê, nêçîr dikirin, lê gur negirtin çimkî tîpî pir bû, waxta vegeriya hatin, serê hespa seqem girtibûn, rûyê wan, birî û bijankên wan spî bûbû. (Tu dibê qey bûne kalê heftê salî) Ew roja em him tirsîyan him cemidîn û him jî kêfxweş bûn. Ber bi nivroy tîpî sivik bû, her kesî rêyê xwe vekir, ser gom û tewleyê xwe avîtin. (Zivistana kes li mal rûnanin nav xwe de malekî hildibijêrin û terin wir rûdinin.) Dora mala me bû ew şeva, em rûdinişt, bêdirew, heya sibe mijûltayî çêdibû; kilam, dengbêj, li ser heyatê qisekirin, henekkirin, yekî xilas dikir, digot dora te ye, de tu êja xwe kil bike, bihejîne. Acizbûn tine bû, ew roj û şevên zivistanê qe ji bîra min nari, ez bêriya wan roja dikim.



Nav: *Nûjîn Bozyîgît*
Herêm: *Hezo | Batman*
Temen: *12*



Navê min Nûjîn e. Ez diwazde salî me. Ez diçim dibistanê. Gundekî Hezo da rûdinê. Navê gundê min Hiskut e. Hevaleka min heye, navê wê Zelîş e. Kêfa min za'f jê ra tê. Em bi hev ra wext derbas dikin, kêfa wê za'f ji min ra tê. Mi'elmekî me heye. Wisa za'f baş e, kêfa min jê ra tê, za'f samîmî ye. Ji me ra tişta dibêje. Ji bonî porê min sor bû, ji min ra digote Qizil Bela, ji bonî carna bela xwe li zarokê piçûk dida ji hevala min ra digote Zalim Zelo. Hevaleka min, qîza apê min, ji mi'elmê me ra digote Sermezino. Mi'elmê min jî ji qîza apê min ra digote Gobelê, Kebçe Qulaq. Wisa kêfa xwe ji hev ra danîtin.

Rojekî, mi'elmê me qeza kir. Haya me jê tine bû ko ew e û ereba wî qeza kiriye. Em xemgîn bûn, me ji wan ra Qur'an xwend felan. Me gote ko ne mi'elmê me Hemdila ye. Me gote ko mi'elmê me Hemdila qeza ke, wisa em ê

bigrîn felan. Û çewa me wisa gote, hevaleka me hate, gote, mi'elmê Hemdila qeza kiriye, ereba wî bûye. Wisa em çûn, em giriyan li sinifê. Me çû, devûçavê xwe şûst. Çend ro wisa di xestê da ma. Ez çûm ewkê, xestê. Ez pêşiya ku diçûm xestê, çûm ba hevalê xwe. Min go ez diçim ko win bixwazin tiştêk yaz kin, win dikarin bidin min, ez ê bidim mi'elmê xwe. Îca ewana jî yaz kirin, xemgînbûna xwe wisa yaz kirin. Navê hevaleka min Zeyneb e, jê ra divê Pixê; navê qîza apê min jî Şevîn e, jê ra divê Kebçe Qulaq, Gobelê; jixwo ez jî ji min ra digo Qizil Bela. Me navê xwe wisa li binî yaz kir. Ez çûm xestê, min wî da mi'elmê xwe. Wisa za'f kêfa wî hat.

Ez hatim malê, ez hatim gund. Piştî wê çend rojên din ez û hevalê xwe wana em hatin hev. Ez, Zelîş, Zeyneb û xwa Zelîş, qîza apê Zeyneb û Şevîn em tev bi hev ra çûn 'hafa mi'elmê xwe. Wisa em çûn odekî dinê. Çay anîtin, me çay xwar. Wisa me kêfa xwe ji hev ra anî. Jinapeka mi'elmê me hebû. Wisa her gav dihate ba me, kêfa xwe ji me ra dihanî. Mi'elmê me ji jinapa xwe ra gote derên, ez ê bi orenciyê xwe ra tiştê xeber dim. Jinapa wî derkete. Mi'elmê me gote "Em jê re tiştê dibêjin naxeyde jî." Îca wisa em tev pê kenyan. Wisa me çay dixwar. Kurê meta min, em bi ereba wî hatibûn, za'f 'ecele dikir, digote "Em herin, em herin!" Îca hate oda me rûnişte. Me gote çay bixwe, çay bixwe, çayeka di jî, çayeka di jî!(dikene) Îca berdaxa wî diqediya, me berdaxa wî dida xweyiyê malê, çay dadigirtin, jê ra danîtin, çixare kişande. Wisa me wî sekinand ji bonî ku em hinekî din jî bi mi'elmê xwe ra wext derbas kin. Wisa em hinekî di jî xeber din, behsa hinek tiştê bikin. Îca em hatin malê. Ewiya jî destê wî di alçî da bû. Wisa çend rojê din hate mektebê. Me mîna partiyê, tiştêkî çêkire. Me ewk kire, me yaziya yaz kire, li sinifa xwe xiste û wisa derbas bû.

Têbinî: Her sê serpêhatî jî sê sal ewil hatine guhdarkirin.



Li Ci Guhdarî Bikim?

Amadekar: Simeya

STRAN

- 1- Eleni Karaindrou - The Weeping Meadow
- 2- Mashrou' Lelîla - Roman
- 3- Hanî Muctehîdî - Gulbarîn
- 4- Lean Brîdges - River
- 5- Rachid Taha - Ecoute Moî Camanade
- 6- Ólöf Arnalds - Surrender
- 7- Nazli & Rewşen - Porsoon Porsoon
- 8- Nîzamettîn Arîç - Serê Kaniyê
- 9- Hello & Kîfak Enta - Noel Kharman
- 10- Leonar Cohen - It Seemed The Better Way
- 11- Şivan Perwer - Ez Dilgeşê Can im
- 12- Solmaz Bedrî - Afetî ten, Fîtneî Can
- 13- Zarok TV - Tirlî Tirlî Temaşe
- 14- Palett - Mosalas
- 15- Cemîl Mûrad - Yarê



Ev kî ye?

Kesê ku di wêneyê de hatîye dayîn kî ye (yê aliye çepê), giringîya wî ji kû tê? Bi jînenîgariya wî ya kurt, ewilîn tu bersiva rast bişîne û ji me kitêbeke li gor dilê xwe qezenc bike.

kovarabar@gmail.com

Bersiva hejmara berê: Avahiya ku di wêneyê de dixuya Lîseya Galatasaray bû ku yek ji lîseyên herî navdar û biperestîj a Tirkîyê ye. Lîseya Galatasarayê an jî bi navê xwe yê berê Mekteb-i Sultânî, bi sîstema fransî, ji bo gihandina karmend û burokratên payebilind hate damezirandin. Ji destpêkê heya îro gelek navdarên kurd jî li vir perwerdehî dîtine.



